


Ji başûrê biçûk  
hunermend Nîhad Gulê:

## Cîhana tabloyên min cîhaneke dojehî ye


● "Ez nikarim bibêjim ku em li ser eynî rêça wî nîfşê yekemîn in, lê ew dimînin mamoste, wan çavên me li ser rengên kurdî vekirin em jî dixwazin -li gor dema xwe- tiştêkî nûjen û hêjayî bînin meydana ku zimanê nîfşên me be, zimanê miletê me be, zimanê dema me be."

● "Dibe ku ev hest di kûraniya dilê min de be ku tim berê min li cihekî dûr e, ez windayî me, ez dûr dikevim ji xwe û xelkê, ez surgun dibim, biyanî dibim, dimirim. Ev ne bi destê mirov e, ez bi xwe nizamim ku ez li ku me, çima hatime dinê."

Rûpel 8-9



## Di CHP'ê de kî kê û kî xwe dixapîne?



● Di 9'ê rezberê de CHP'ê komcivîna xwe ya nû çêkir û rêveberiya xwe ya nû hilbijart. Medyaya tirk, rojev bi peyama û dimenên li ser vê partiye dagirtin. Bi piranî girîngiya CHP'ê bi şirkatiya wê ya hikûmetê ve tê girêdan. Hebûna partiyeke sosyal demokrat di nav kaolîsyonê de ji bo Mutabakata Millî pêwîst e.

● Hatina Deniz Baykal jî bi rengê "Mutabakata Millî" ya nû ve tê girêdan. Îro mutabakata rasterast li ser nijadperestiyê pêk tê, lewre dewlet CHP'ê jî ji bo vê yekê amade dike. Tê gotin ku dewlet dixwaze hemû sosyal demokratên di DSP'ê de bigihîne hev, an jî CHP'ê bike partiyeke şovenîst wekî DSP'ê.

● Gotinên Baykal jî li gorî daxwaza MGK'ê ne, bes hinek dengên aşîxwaz ji komcivîne bilind bûn. Li gorî derdorên siyasî Baykal niha naxwaze rasfî dijberiyê were, lewre li hemberî van kesan bêdeng dimîne, lê ev kesên ku ji Baykal gaven ji bo aştiyê hêvî dikin, xwe dixapînin.

Rûpel 2

### DÎROK

#### Apê Mûsa bi wan hesiyabû

Ji rojan roja pêncşembê bû. Ez çûm mala Apê Mûsa, li beşçeyê, me çay vedixwar. Ez û wî tenê bûn. Min egera vê pirsgerêkê jê pirsî: Ya xalê delal ez çi qasî bala xwe didim xortên kurd ên pêşverû çaxa ku li welêt dixwendin, welatparêz bûn, lê ku tene Stenbolê ew xortên delal tîn guhartin. Bi texmîna min tiştin wan berevajî dikin. Hinek wan serûbinê hev dikin. Li ser vê ramanê tu çi dibêjî?

Rûpel 7

### WÊJE

#### 1903 -Ciwantirîn jiyan- 1984

Heştê û yek salên dûr û dirêj, li her derê û li hemî gavan, li hemberî hemî rengê sîtem û zordariyan bi şiyaneke bê dawî, bi berxwedaneke bêhempa, çavên xwe ji kesî re neşikand û serê xwe ji kesekî re neçemand.

Rûpel 12

### CIVAKÎ

#### Li qeraxa Behra Spî Kemal, Îsmet û kurd

Di rûyê Ismet de xuya dikir wekî bibêje: "Gelo me şaşî di ku de kiriye? Gelo ev xewn e ez dibînim an xewnerojek e? Ew kurdên ku min bi destên xwe li Qoçgiriye, li Dêrsimê û li Çiyayê Agirî binax kiribûn û ser beton kiribû ka çawa dibe ku piştî ewqas sal li qeraxa Behra Spî raperîne çêdikin? Na na... ev ne rast e! Ev ne kurd in."

Rûpel 4

### CAND

#### Ferheng pêwîst e lê?

Niha bi destpêkirina weşana televîzyona Medê, zimanê kurdî bi teknolojiya herî modern li welat û li derveyî welat çû mala her kurdî. Zimanê nivîsandin û axaftinê bû yek. Hemû zarava û devokên kurdî derketin holê. Her êvar bi milyonan kurd di mala xwe de, di her warî de, guhdariya kurdî dikin.

Rûpel 13



# Di CHP'ê de kî kê û kî xwe dixapîne?

**Cihgirtina CHP'ê ya di nava koalîsyonê de ji bo 'Mutabakata Millî' pêwîst e, bi hebûna CHP'ê rejîm perdeyekê dikişîne ser rûyê xwe, bi şîrkatiya partiyekê çepgir "lihevkirina neteweyî" têkûztir dibe.**

Di 9'ê rezberê de Partiya Komarê ya Gel (CHP) komcivîna xwe ya nû çêkir û rêveberiya xwe ya nû hilbijart. Hilbijartina Deniz Baykal ji bi rengê "Mutabakata Millî" ve tê girêdan. Îro mutabakat rasterast li ser nijadperestiyê pêk tê, lewre dewlet CHP'ê ji ji bo vê yekê amade dike. Zülfü Livaneli yê ku di gava dawîn de ji berendamtiyê vekîşî di quncikê xwe yê rojnameya Milliyetê de bi dorfireh li ser dekûdolabên rayedar û medyaya tirk a li hemberî sosyal demokratên disekine. Livaneli bal kişand ser gotin û kirinên Deniz Baykal û piştgiyaya ku medyaya tirk da wî. Li gorî Livaneli dewlet dixwaze CHP'ê qels bike û hemû sosyal demokratên di DSP'ê de bigihîne hev, an jî CHP'ê bike partiyekê wekî DSP'ê ku tu ferqa wê û MHP'ê nemaye. Livaneli gotinên Baykal wekî nîşana vê yekê dibîne. Serokê Giştî yê nû Deniz Baykal piştî hilbijartina serokatiya CHP'ya Stenbolê gotibû: "Hevalê ku

hate hilbijartin hem sunnî û hem jî tirk e." Di axaftina Baykal a di komcivîna jî dîsa heman mesajê hebû, Deniz Baykal digot: "CHP dixwaze pêvajoya netewebûnê bibê serî." Bi destê dewletê gurkirina nijadperestiyê tirkên bû sedem ku hemû partiyên siyasî yê rejîmê bi bayê nijadperestiyê bikevin û bi awayekî eşkere bibin ûlkûdaşê MHP'ê. Divê bê gotin ku vê pêvajoyê, berî Baykal di CHP'ê de dest pê kiribû, Serokê berê Hikmet Çetin jî fer-

Kurdistanê ne, civak li gorî helwesta xwe ya li hemberî tevgera azadiyê dibê du beşan; bereyê nijadperestan û bereyê azadîxwaz û aşîxwazan. Di CHP'ê de tevlihevîyek jî balê dikişîne ser xwe. Piştî gotinên "Hevalê ku hate hilbijartin sunnî û tirk e" serokên 15 rêxistinên CHP'ê yê li Kurdistanê daxuyaniyek dan çapemeniyê û piştgiyaya xwe ji bo Baykal diyar kirin. Di eynî daxuyaniya ku Serokê CHP'ê ya Amedê Mesut Değer xwend de çareser-

syon li ser çareserkirin meseleya kurdî disekine û qala şerekî nuxamtî, ri-jîna xwîna birayan dike. Her wiha mesele wekî gelşa kurdî tê binavkirin. Dîsa deklarasyonê de zanîn ku barê vî şerî kedkar dikişînin, lewre jî divê xwîn bisekine, mesele bi riya demokratîk û aştiyane çareser bibe. Di deklarasyonê de doza rakirina qedexeya li ser nasnameya kurdan dibe. Deklarasyonê daxwaz dike ku çareserkirina meseleyê bibê xala yekemîn di rojê partiyê de. Ra-



**Kemal Parlak**



**Salman Kaya**

wekî nîşana piştgiyaya delegeyan ya ji bo aştiyê, tê şîrovekirin.

Ev qewimîn gelek pirsan ji xwe re tînin. Ji ber ku gotinên Deniz Baykal bi van tiştan re li hev nakin. Li ser vê nakokiyê me dîtî û ramênên hin kesan pirsî Mebûsê Enqereyê yê CHP'ê Salman Kaya ku bi dîtîna çepgirî tê nasîn, gotinên xwe bi divêyan diqedîne. Salman Kaya jî piştgiyê daye Baykal û bûye endamê meclîsa partiyê. Kaya dibêje: "CHP divê hinek gavên demokratîk bi hikûmetê bide avêtin, an na divê têkeve nav refên bereya dijber a gel." Kaya der heqê deklarasyonê li ser meseleya kurdan de wiha dibêje: "Wekî partiyekê sosyal demokrat CHP divê piştgiyaya hemû gelên vî welatî bike." Li ser pirsên gelo wê bike? Salman Kaya tim dibêje: "Divê bike." Serokê CHP'ê ya Êlihê Nejat Nasıroğlu jî yek ji kesên ku piştgiyê daye Baykal e. Lê Nasıroğlu wekî mirovekî li derî partiyê dipêyive. Li gorî Nasıroğlu ji sedî 90'ê delegeyan piştgiyê dane deklarasyonê, ji ber ku her kes

aştiyê dixwaze. Nasıroğlu dibêje ku CHP ne partiyekê sosyal demokrat a rasteqîn e, lê di nav wê de mirovên sosyal demokrat hene.

## Baykal dixwaze dengê aşîxwaz bihelîne

Serokê HADEP'ya Stenbolê Kemal Parlak balê dikişîne ser nakokiyaya di navbera gotinên Baykal û rûdanên di CHP'ê. Kemal Parlak jî dide zanîn ku mebesta Deniz Baykal piştgiyê deklarasyonê ne yek e. Li gorî Parlak mebesta Baykal serdestkirina politikayên şovenîst û nijadperest e. Serokê HADEP'ê di deklarasyonê li ser meseleya kurdî tevî hinek xalên çewt jî wekî gaveke baş dinirxîne, bi awayê ku Kemal Parlak dibêje, heke kesên ku deklarasyon îmze kirine, xweditiyê jê re bikin, wê arîşeyên mezin di nava CHP'ê de derkevin, dibe ku CHP ji nû ve parçe bibe. Li gorî Kemal Parlak, serokatiya CHP'ê dixwaze dengê aştiyane, di nava dengê şovenîst de bihelîne, lewre li hemberî deklarasyonê bêdeng maye. Divê bê gotin ku kontrayên tîrê nadin tu rûdanên aşîxwaz, berdevkê kontrayan Emin Çölaşan piştî komcivîna dest bi êrişên li ser Tomris Özdenê kir.

Kemal Parlak dibêje: "Xuya ye di nav refên CHP'ê de mirovên demokrat û aşîxwaz hene, bes bêrêxistin in, lewre jî nikarin xwe serdest bikin, di nav politikayên rayedarên partiyê de dihelin. Heke kesên demokrat karibin xwe bi rêxistin bikin û xwedî li vî deklarasiyona xwe derkevin wê bibin sedema rûdanên gelek baş di warê demokratîkkirina Tirkiyeyê de. Daxwaza me jî CHP'yeke demokrat e, bes rewşa objektîf û daxwaz li hev nakin."

**SAMÍ BERBANG**



**Delegeyên CHP'ê ji pirsgerêka kurdî re çareseriyekê demokratîk xwestin.**

manek jî rêxistinên partiyê re şandibû da ku ew beşdarî merasîma cendekên leşkeran bibin.

## Di CHP'ê de şovenîst û demokrat bi hev re

Heta wê derê mirov kare bibêje zêde tişteki balkêş nûn e, tê zanîn ku ev hemû encama şerê

kirina doza kurdî bi riya demokratîk û aştiyane jî tê xwestin. Mesele bi vî jî namûne, li ser navê delegeyên komcivîna deklarasyonê di komcivîna de ji aliyê Fehmi Işıklar ve hat xwendin, piraniya delegeyan bi çepikên xwe piştgiyê dan deklarasyonê. Deklara-

kirina Rêveberiya Neasa yî, sistema cerdevaniyê, walîtiya herêmî û jî gel dîrxistina tîmên taybet dîsa di nav deklarasyonê de cih digirin. Li komcivîna jîna albayê ku li Stewrê hate kuştin, Tomris Özden bi dengê herî zehf bû endamê meclîsa partiyê, ev tişt jî

# Hilpîşkîna Brûskî û kombûna Dublînê

Li başûrê Kurdistanê Hilpîşkîna Brûskî ango Têvgera Welatê rojê dewam dike. Li gorî agahiyên ku gihîştine destê me bi êrişên ARGK'ê herêma ku lê şer diqewime û deverên ku ketine bin kontrola gerîla berfireh dibin. Piştî bidestxistina Bamerlî û Sersingê gerîla niha jî amadekariya dorpeçkirina Zaxoyê dikin. Li gorî agahiyan gerîla li derên ku bi dest xistiye, bi gel re civînan çêdikin û rêveberiya wan deran didin destê komîteyên gel. Tê gotin ku gerîla avêtine ser qereqolên PDK'ê yê dora bajêr, peşmergeyên di qereqolan de revîne nava bajêr. Li hemberî êrişên gerîla Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî jî qala tunekirina

PKK'ê kirin. Mesûd Barzanî derdorên ku piştgiyê didin PKK'ê tehdît dike û jî Îran û Suriyeyê alîkarî xwest. Her wiha hêzên PDK'ê êrişan dibin ser penaberên li Kampa Etrûşê, dîsa pêkûtiya li ser derdorên ku guh nadin banga PDK'ê ya seferberiyê jî gur dibe.

Li aliyê din kombûna duyemîn a Dublînê jî di 12'yê rezberê de dest pê kir. Di kombûna duyemîn de Îngilistanê jî wekî çavdêr cihê xwe girt. Tê gotin ku wê li ser mijarên di civîna yekemîn de herdu aliyên li hev kirine bi berfirehî guftûgo çêbin. Wekî tê zanîn li ser mijarên wekî bêçekkirina Hewlêrê, parvekirina pereyên ku ji gumrukê, berdana dîlan, vejandina hi-

kûmeta herêmî û ewlehî Tirkiyeyê lihevkerin çêbûbû. Li gorî daxuyaniyê PDK'ê di civîna yekemîn de biryara tunekirina PKK'ê jî hatibû dayîn. Li gorî agahiyan di kombûna duyemîn de Amerîkayê jî PDK û YNK'ê pejirandina otonomiyê dixwaze. Tirkiyeyê berî kombûnê bi Îran û Suriyeyê zirve çêkiribû, daxwaza parastina yekparetiya erdê Iraqê dubare kir û xwest ku PDK-YNK berpirsiyara rawestandina çalakîyên PKK'ê li Başûr bigirin ser xwe. Li gorî plana Amerîkayê piştî vî kombûnê Mesûd Barzanî û Celal Talabani wê li Washingtonê li hizûra Clinton peymanî aştiyê îmze bikin.

Lê heta civîna duyemîn ji bo

pêkanîna şertên lihevkerinê tu gav nehat avêtin. Her wiha destpêkirina êrişên ARGK'ê arîşeyên nû derxistin pêşberî peymanî aştiyê. Dîsa êrişên terorîstî yê ajanên tirk û PDK'ê li devera soran dibin sedema reaksiyona gel. Hefteya çûyî li Suleymaniyê protestoyekê girse yî li dar ket, beşdaran li wir ala tirkên şewitandin û êrişên Tirkiye û PDK protesto kirin. Li gorî derdorên siyasî pêkhatina peymanî aştiyê di navbera herdu hêzan de aştiyê bi xwe re nayîne ji ber ku ev plan hevkeşeya hezan a nû li ber çavan nagire, guh nade îradeya gel, kesên ku peymanî îmze dikin jî nejidil in.

**Navenda Nûçeyan**





## Şerê kevnepereştî û nûjeniyê

**Ev 50 sal e gelo PDK'ê çend pirtûk, rojname derxistine, çiqas gel zana kirin, em bihêlin gel, kadroyên hizbî, pêşmergeyên xwe çendî perwerde kirine. Gel jî, pêşmerge jî dixwazim zana bibin, lê serokên wan nahêlin ew zana bibin.**

Wekî ku hûn dizanin şerê mezîniya niha di navbera PKK û PDK'ê de heye. Gelo ev çito şer e, ji bo çî ev şer derketiye, naveroka vî şerî çî ye?

Ji bo ku em vî şerî baş nas bikin divê em PKK û PDK'ê baş nas bikin. Yanî dîroka wan, bingeha wan, îdeolojî, siyaset û felsefa wan nas bikin.

PKK, fikr û ramanên xwe li ser bîr û baweriya zanistî damezrandiye û êşkere dibêje ku mafên çîna bindest diparêze. Her wiha wê rêxistina xwe, tanzîma xwe li ser vî bingehê ava kiriye. Siyaseta xwe jî, karê xwe jî li gorî eynî seretayan dide meşandin. Qeweta xwe ji gelê xwe, ji miletê xwe distîne. Piştî xwe nasipêre tu hêz û dewletên derve.

Li aliyê din bîr û baweriyeke hemdemî û ilmî ya PDK'ê nîn e, fikir û ramanên wê kevnare ne. Ne mafên çîna bindest nîn e, ne mafên serdestên neteweyî, bi tenê mafên çend kesan an jî malbatan diparêze. Rêxistin û tanzîma wan jî li ser vî esasî hatiye damezi-

randin. Siyaset û karê xwe jî li ser vî esasî dide meşandin. Ji ber vî jî, baweriya xwe bi gel û milet neaniye, her hêvî jî qewetêke biyan, xaricî kiriye û li cem biyanîyan cih girtiye. Armanç û hedefên wan jî ne rizgariya gel e, rizgariya şexsî ye, berjewendên malbatî ye. Ji bo vî tiştî ye ku her dem dibêjin otonomî, an jî hukmê zatî dixwazin, tu caran nabêjin mafên çarenûsî, an jî Kurdistaneke azad û serbixwe.

Ka em bibînin, heta niha ev 50 sal çêbû, gelo çend pirtûk, rojname derxistine, çapemeniya wan çî ye, çiqas gel zana kirin, em bihêlin gel, kadroyên hizbî, pêşmergeyên xwe çendî perwerde kirine. Ne ku ez gel an jî pêşmerge biçûk dikim, na esas gel jî, pêşmerge jî dixwazim zana bibin, lê serokên wan nahêlin ew zana bibin. Yanî li pêşiya ilm, li pêşiya zanabûnê bûne kelem, bûne asteng.

Di dîrokê de PDK'ê nehiştiye ku bîr û baweriyeke nû û hemdemî ne bes li başûrê Kurdistanê, li hemû Kurdistanê çêbibe, her lê daye. Wan bi xwe tu tiştî ji bo xêra kurdan nekirine û nehiştine ku ji bilî wan kesek doza Kurdisanê bide meşandin.

Li başûrê Kurdistanê yê wekî Mihemed Axayê Mêrgesorî û kurên wî Faxir û Seîd û Cewher û xizmê wî Siwar Axayê Şerwanî digel

14 kesan pêşî kirin zîndanê û paşê ew kuştin. Ev xizm û mirovên Barzanî bi xwe bûn. Li Silêmaniyê Hacî Îbrahîm Çermega û Mecîd Rostem digel 12 kesan dan kuştin û dîsa her li Silêmaniyê Ebdurrahman Salih Xilê û Rauf Hacî Qadir digel 10 kesan dan kuştin. Dîsa Serokê Hereketa Têkoşaney Rencberanî Kurdistan Rauf Kamil Eqravî û Sadiq Omer Sindî jî kuştin. Heta xizmê wan ên nêzik Şêx Osman Berzanî jî, ji ber wan reviya kete destê Sedam, paşê ew çawa hate kuştin tê zanîn. Alî Eskerî, Dr. Xalit, Babeşêx Yezîdî û bi sedan kesên din, çawa wan û dewleta Tirkan bi hev re ew

kuştin tînan zanîn. Li Rojhilatê Kurdistanê Suleyman Muînî û Melle Aware, ku berpîrsên PDK'ê Îranê bûn, teslîmî Şahê Îranê kirin û hatin kuştin.

Ka em bibînin li bakurê Kurdistanê kî kuştine. Dr. Şivan (Seîd Kirmizitoprak), Seîd Elçî, Faîk Bucak ku xwestin tevgereke nû li bakurê Kurdistanê saz bikin, lê belê qebûl nekirin û ew kuştin. Yanî li hemû Kurdistanê yê ku ji bo wan (ne ji bo milet) xizmet nekiribûna an jî cuda bifikiriyana qebûl nedikirin û didane kuştin. Li başûrê rojavayê Kurdistanê (Başûrê Biçûk) jî, ozanê mezîniya Cîgerxwîn û helbestvan û nivîskarê bi nav û deng Apê Osman Sebrî jî bi zehmetî ji destên mala Berzanî xelas bûn.

Belê em dibînin ku PKK û PDK du fikrên esasî ne ku li Kurdistanê dijîn. Yek fikra şexsperestî ye, yek jî fikra gelperestî ye. Piştî sala 1982'yan ku PKK vegeyriya welat, hê grubên nû derbas bûn, ji van gruban Şahîn Kilavuz xistin kemîna dewletê û 8 gerîla şehîd kirin. Ya ku gelek ew aciz kir jî pêngava 15'ê Gelawêjê bû. Gotin "Tu car em qebûl nakin ku hûn şerê dewleta Tirkan bikin. Bavê me nesîhet kiriye ku hûn bi tirkan re dost bin. Piştî 15'ê Gelawêjê êrişên xwe li ser PKK'ê diwartir kirin û di destpêkê de pirtir bi dizî kirin. Ji wê rojê û bi vir ve heta niha bi sedan kes jî PKK'ê û welatparêz kuştin an jî teslîmî tirkan kirin. Çend nimûne: Hemîd Avcî bi destê hevalbendên xwe, ceşên gerdiyan li Şemzînanê kuştin. Li Urmîyeyê Hesên Çawîş kuştin. Di sala 1992'yan de çawa bi Tirkan re êriş anîn ser gerîlayên PKK'ê û çiqas kes hatin kuştin û birîndarkirin hûn dizanin. Li hemberî van êrişên xiyaretkarane, PKK her doza aştiyê kir.

Niha em dibînin çûne Dublînê û qerar wergirtine ku dîsa bi dewleta tirkan re êrişên xwe birdewam bikin. Berpîrsê wan yê li Enqereyê Sefîn Dizayî dibêje: "Em dixwazin bi hemû dewletên cîran re, pêkve êrişê bidin ser PKK'ê. Ev tewrên wan û kirinên wan sebebê pêngava PKK'ê ya 26'ê gelawêjê baş dide diyarkirin.

AHMET XALIT

### ...KURTENÜÇE...

#### Xelata Apê Mûsa û Şehîdên Çapemeniyê tînan dayîn

Xelata Musa Anter û Şehîdên Çapemeniyê di 20'ê rezberê de digihîje xwediyên xwe. Li gorî daxuyaniya Komîteya Amadekar, wê encama berebaziya xelatê roja 15'ê mehê diyar bibe. Wê di 20'ê mehê de li Navenda Çanda Mecidiyeköyê ahengek li dar bikeve û xelat wê li xelatgiran bînan belavkîrin. Ev berebazî îsal jî aliyê rojnameya Yeni Politikayê ve hate sazîkirin.

#### Gelê Baxlarê êrişî polîsan kir

Li Amedê gel li hemberî zilma hêzên dewletê serî hilda. Tê gotin ku di 12'yê mehê de li Taxa 5 Nisanê polîs bi mebesta kontrolkirina nasnameyan rê birîne, gel jî bi keviran êriş birîne ser wan û gelek ji wan birîndar kirine. Bi hatina hêzên nû gel belav bûye. Di vî bûyerê de bi navê Önder Yıldırım, Ramazan Yıldırım û İsmail Topçu 3 kes hatine girtin.

#### PDK berê xwe da êzdî û aşoriyan

Piştî êrişê hêzên ARGK'ê ya li ser PDK'ê, wê jî berê xwe da kurdên êzdî û gelê aşorî. Yekitiya Êzidiyan kirinên PDK'ê bi daxuyaniyekê protesto kir. Tê de, hevkarîya PDK'ê ya bi dewleta tirk re jî tê protestokirin. Her wiha PDK êrişê dibê ser aşoriyan jî, bi gulebarankirina erebeyekê du aşorî hatin kuştin. Ev kirin jî, jî aliyê rêxistinên demokratîk ve tê protestokirin.

#### Hêzên dewletê êriş bir ser girtiyên Bucayê

Di 12'yê rezberê de girtiyên Girtîgeha Bucayê li dijî kirinên rayedarên girtîgehê yê nemirovî protestoyek li dar xistin. Di vî livbaziye de girtiyên ji bo demêke midûrê girtîgehê dîl girtin, pişt re berdan. Hêzên dewleta tirk êriş birin ser girtiyên gelek ji wan birîndar kirin. Li gorî daxuyaniya girtiyên, sedemeke livbaziye jî protestokirina salvegera cuntayê bûye.

#### Cuntaya 12'yê Rezberê hate lanetkîrin

Di salvegera 15'mîn a cuntaya leşkerî ya 12'yê Rezberê de daxuyaniya û xwepêşdanên protestoyê li dar ketin. Dêrdorên demokratîk dan zanîn ku piştî 15 salan hêjî qanûn û qeydeyên ku cuntayê danîn tînan bikaranîn. Platforma Demokrasiyê li Enqereyê xwepêşdanek li dar xist. Hate xwestin ku ji bo jîholêrakirina bandora cuntayê gel li ber xwe bide.



# Li qeraxa Behra Spî Kemal, Îsmet û kurd

Navê 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 42'an de peyva veşarî **'KURDISTAN'** ditine û kaseta Koma Çiya **"Dilana bê sînor"** qezenc kirine:

- Sedat Yurtdaş  
Enqere
- Aysel Ertaş  
Aliğa/İzmir
- Mahsum Yıldız  
Bayrampaşa/Stenbol
- Hilmi Akay  
Antalya
- Hacı Kırmızıgül  
Amed

Roja 3'ê rezberê li Mersînê mitîngêk hate lidarxistin. Mitîngê li kêleka îstasyona trenê û li ser Cadeya Îstiklalê dest pê kir. Bi hezaran welatperwerên kurd bi yek dil û yek dengî dirûşmên aşî û biratiyê diqîriyan. Li cihê destpêka mitîngê li ser kevîr heykelê Îsmet hebû. Min dêhna xwe dayê ku her wekî Îsmet bi xwe ye û hatiye ji xwe re şaş û şermezar bûye, li van mirovan guhdariyê dike.

Di rûyê Îsmet de xuya dikir wekî bibêje: "Gelo me şaşî di ku de kiriye? Gelo ev xewn e ez dibînim an xewnerek e? Ew kurdên ku min bi destên xwe li Qoçgiriye, li Dêrsimê û li Çiyayê Agirî binax kiribûn û ser beton kiribû ka çawa dibe ku piştî ewqas sal li qeraxa Behra Spî raperîne çêdikin? Na na... ev ne rast e! Ev ne kurd in." Çavên Îs-

met li serî sor dibûn, pişt re di cih de diqerisî, reş û şîn dibû û careke din hişk dibû û dibû

avahiya Navenda Çandê Atatürk heye. Li ser dîwarê wê bi tîpên mezin dirûşma Atatürk ya

Parka Atatürk û Behra Spî heye. Zarokên kurdan dor li Kemal pêçabûn. Di destên zarokên

ji faşizmê re bibe goristan" diqîriyan.

Min bala xwe dayê ku rewşa Kemal jî, ji ya Îsmet ne cûda bû.

Ew jî wekî destbirakê Îsmet dike nake tu wateyê nade vê rewşê. Her wekî bipirse: "Ma min negotibû ji xeynî tirkan gereke kes li vî welatî nejj? Ne min negotibû gerek e koka kurdan bê qelandin? Ma min Komara Tirkîyeyê ji tirkan re ava nekiribû? Min xortên tirkan nexistibûn nobedarê wê? Ka ew tirkên ku her libek dinyayê dihejîne? Kê ev kurd vejandine? Karê van li vir çî ye?" Tu kesî bersiva Atatürk jî nedida. Atatürk jî wekî Îsmet di cihê xwe de reş û şîn dibû û li ser kevîr dibû heykelekî bêgiyan. Rewşa wan a li hemberî kurdan zehf şerpeze bû, wekî ku bibêjin: "Lo me çî kir, me çî kir me xwelî li serê xwe kir."

MIRAZ RONÎ



peykerekî bêgiyan li ser kevîr.

Meş, ji kolana îstasyonê ji ber Peykerê Îsmet bi rê ket û ber bi kolana Kemal Atatürk ve rêz bû. Li bakurê Meydana Cumhuriyetê

herî navdar: "Xwezî bi kesê ku ji xwe re dibêje ez tirk im" heye. Li pêş deriyê avahiye heykelekî Atatürk heye. Heykel bi kincê leşkerî ye û mezin e.

Li başûrê meydanê,

kurdan de pankartên ku li ser "Bijî biratiya gelan, bijî aşî" nivîsandî, bi sînga wî ve kiribûn. Di nav şeqan de zarokên kurd îşareta serkeftinê didan û dirûşmên "Wê Kurdistan

**XAÇEPIRSA BIXELAT (42)**

R	M	K	L	J			
Q	A	Z	Î	M	Û	H	A
G	Â		O	L	E	E	N
B	I	Z	Â	V	Û	E	Q
H	A	K	Î	M	Î	E	Û
N	A	K	O	K	Î	E	S
Î	D		D	E	Z	G	E
Î	N		R	A	Î	N	
Î	N	A	N	D		T	E

PEYVA VEŞARÎ →

**XAÇEPIRSA BIXELAT (44)**

Şeref	Pê	3	Partiyek li Tirkîyeyê	Paşgîrek	Bermaliya male	Paytexta Arnavutlukê
Hozaneke tirk (wêne)	Lehçe			Mehek	Qey	
8						
Bajarêkî kurdî			Sembola çarîne Enstrûma nek		Dijberî bejî	
Navêk						
			5	Osmiyûn	1	Genimê hêrandî
				Li Swîsre robarek		Cinavkek
Sodyûm		2	Besek ji bedena mirov Danek		Bî erebî ez	
Hidrojen					Sulh	
	Niha					
	Tahsin					7
Roj				Flengek		
Notayek				Xosewista Mem		
Çamûr			6		Fîlmeke Spielberg	
Teyrek						
					4	

PEYVA VEŞARÎ →

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinixînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 44'an; kaseta **NİLÜFER AKBAL** "MİRO" ye.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**

Kasetaya **NİLÜFER AKBAL** "MİRO"



# Cenga propagandayê li Kurdistanê

Di warê cenga psîkolojîk de Kurdistan îro ji dewletên împeryalist re bûye cihê ceribandî. Bi tenê di sala 1994'an de 3 milyon dolar daye rêxistinên progandayê, da ku stratejiyan ji bo wê çêbikin. CIA û parêzkarên sîstema împeryalist her cure metodên xwe (Jiholêrakirina serhildanan, şerê psîkolojîk, anti-propaganda, avakirina rêxistinên kontergerîla, tirsandina gel, rûşekirina şoreşê li hundir û derveyî Kurdistanê, jihevbirina gel û şoreşgerên Kurdistanê, û hwd.) li dijî tevgera serxwebûn û azadiya Kurdistanê, diceribînin.

Dîroka cenga propagandayê bi awayekî rêk û pêk di cenga cihanê ya duyemîn de dest pê kir. CIA'yê di cenga duyemîn de hinek keftûleştên anti-propagandayê çêkiribûn û wiha ji şaxekî şerê psîkolojîyê yê taybetî li welatên kapîtalîst li hemberî Yekîtiya Sovyetê dest bi xebatê kir. Berî wê di cenga duyemîn de ji dewleta Amerîka, Îngilistan û Fransayê li dijî Hitler belavokek bi zimanê almanî, li ser navê rojnameyên alman, li Almaniyayê belav kirin.

Binêrin ji bo ku agahiyên şaş di nav gel de cihê xwe bigirin, Rênişannameya Operasyona Psîkolojîk (Field Manual of Psychological Operation) ya Artêşa Amerîkayê çî pêşniyar dike da ku

şoreş têk here:

Divê di nav gerîla û serokatiya rêxistinê ya ramanî de alozî û arîşe derkevin; di nav endamên partiyê de divê bawerî bi serokatiya partiyê bişikê; komên olpe-rest divê li dijî şoreşê derkevin, komên hindikahiyên etnîkî û olî ji partiyê dûr bikevin; mirovên dewlemend û xwedî bandor bi baweriya ku wê berjewendiyên xwe winda bikin, divê ji şoreşê bitirsin û li dijî wê derkevin; divê alîkariya komên reformîst were kirin, da ku li dijî şoreşê rabîn...

Dewleta Amerîka di sala 1986'an de zêdeyî 1,5 milyar dolar ji bo kampanya çapemeniyê li dijî sandinîstên Nîkaraguayê li Ewropayê finanse kir. Bi wan dolaran bi kontra re li Îspanya, Fransa û li Almaniyayê cenga propagandayê li dijî dewleta Nîkaragua hatibû vekirin. Bi zanebûn di rojnameyên Ewropayê de agahiyên xelet û şaş li dijî Sandinîst dihat weşandin û wan dixwestin Sandinîstan bi nebaşî nîşanî gelê Ewropayê bi-

din, da ku dewletên dinê alîkariya dewleta Nîkaragua nekin û kontra li dijî şoreşê bi ser bikevin.

Li gorî wan qeydeyan Tirkîye bi seferatên û rêxistinên xwe yê ragihandinê agahiyên xelet diweşîne. Dewleta Tirkîyê bi zanebûn gundan wêran dike, zarok, jin û meran dikuje, wêne û dûmenan dikişîne û rojna-

yine, ew li dijî dewleta Tirkîye ji propagandayê dîkin. Medya bûye çekeke nû.

Her wiha dewleta Tirkîye ji bi serokatiya seferatên xwe bi salan anti-propagandaya şoreşa Kurdistanê dike. Dewleta Tirkîyê û CIA'ê cenga propagandayê rasterast an jî nerasterast li Ewropayê dimeşînin. Di ko-

dewleta Tirkîyê (Ikitelli) hemû bi zanebûn agahiyên şaş li dijî şoreşa Kurdistanê diweşînin, da ku gelê kurd li Kurdistanê û derveyî welat bipelişe, tevlihev bibe û wiha ji şoreşa Kurdistanê têk biçe. Dîsa rêxistin û çapemeniya di xizmeta şerê taybet de dixwazin li dervayî welat têkoşîna rizgariya neteweyî ya

vegerina xwe ya Ewropaya an jî Amerîkayê li dijî şoreşa Kurdistanê bangêşiyê bikin.

Metodeke cenga propagandayê ji ev e; dewleta tirk nûçeyan bi Anadolu Ajansı an jî li ser navê hinek rojnamevanan, nûçeyên xelet dişîne Ewropaya û Amerîkayê rojnameyên Ewropaya wan nûçeyan di rojnameyên xwe de çap dikin û pişt re ji çapemeniya tirk wan wekî peyamên ji rojnameyên biyan pêşkêş dikin. Bi wê metodê dixwazin wan propan-dayên reş, spî bikin û kirasê objektîvîzmê li wan bikin, da ku xwendevanên rojnameyan ji wan nûçeyan bawer bikin. Heke mirov gotineke tenê ji wan çewt-agahiyên di mejiyê xwe de bigire, ew digihîjin armanca xwe û bandora wan agahiyên çewt dikare nexweşiyên di giyana mirovên neşidandî de çêbikin.

Li aliyê din piraniya xwendevanên van rojnameyan bi tenê li wêne û sernivîsan mêze dikin û jê zû bawer dikin, ji qismekî wan bawer dikin.

Wisa dixuye ku wê dijminên gelê kurd wê bi hemû şiyana xwe cenga propagandayê û şerê psîkolojî bidomînin. Lewra ji divê gelê kurd bi xwe medya xwe ya alternatîv çêbike û yê heylî ji xurt bike.



Dewleta alman di warê şerê psîkolojîk de ji alîkariya Tirkîyeyê dike.

Kurdistanê, wekî terorîst nîşan bidin. Lewma dewleta tirk car caran rojnameyêkê wekî rojnameya Serxwebûnê diweşîne û gotinên serokê PKK'ê li gorî daxwaza xwe diguherîne.

Dewleta Tirkîyê û hevalbendên wan li Ewropaya û li Kurdistanê li ser navên rêxistinên çep an jî "Partiyên Kurdan" ji başûrê Kurdistanê peywendiyên xwe bi wan re çêdikin û bi hev re anti-propagandaya şoreşa Kurdistanê dikin. Mirov dikare gotinên Barzanî û Samî Abdurahman di wî warî de biweşîne (analîz bike). Heta nivîskar û mirovên bi nav û deng ji aliyê dewleta tirk ve tînxwendin, da ku piştî

mevîyên Tirkîyeyê ji wan kirinan li PKK'ê bar dîkin. Di wî warî de rojnameyên biyanî ku ji aliyê berjewendiyên aborî û siyasî ve nêzikî dewletên xwe ne alîkariya destbîrakên xwe yê tirk dîkin. Ev dewlet ji parastina berjewendiyên xwe yê li Tirkîyeyê û firotina çekên xwe, cihê di wê cenga propagandeyê de digirin. Lê car caran dema ku dewleta Tirkîyeyê daxwaza wan bi cih ne-

var û rojnameyan de anti-propagandaya PKK'ê dîkin. Dewleta Almanya di sala 1989'an de mirovên PKK kirin girtîgehê û doz li wan vekir û niha ji dixwaze dozeke mezin dîsa li dijî PKK'ê veke... Bêguman bi wan bûyeran dagirkerên Kurdistanê û hevalbendên wan dixwazin bi wan kampanyayan şoreşa Kurdistanê li Ewropayê îzole bikin.

Niha rojnameyên

Welatê Me/Bruksel

Her dem ramyariya dewleta Amerîkayê ne li gorî zanistî û mantiqî ye. Êdî hemû şerên piştî windakirina şerê Vietnamê bûne şerê ku dewleta Amerîka hevî dike ji vê traumata û sendroma Vietnamê xwe azad bike. Ev nexweşî, ango sendroma Vietnamê, ketiye nav hemû kategoriyên civakî û di Amerîkayê de pirsgerêkeke pîrr mezin e. Ji bo rihabûna ji vê nexweşiyê dewleta Amerîkayê her dem dikeve xaka dewletekê, an jî alîkariya dewleteke dîktatorî dike da ku ew bi piştgirîya wê bi ser bikevin. Windakirina şerê Vietnamê nehatiye ji bîrkirin. Lewre ji di meha adarê de artêşa tirk bi destûra Amerîkayê kete

## Polîtîkaya Amerîkayê ya derveyî welêt

Kurdîstana Başûr û li vê derê pir mirovên bêgune hatin kuştin. Bi vê livbaziya dîsa dewleta Amerîkayê dest pê kir û Sedam wekî Ahrîman nîşan bide. Bêguman ev rast e. Lê bi vê azîneya dewleta Amerîkayê ya li ser pîrsa neteweyî û traumata neteweyî ya bal kişand li ser rêjîma Iraqê û dixwest wiha xwe ji sendroma Vietnamê azad bike. Li ser xalên ramyarî û aborî emê pişt re binivîsînin

Bi şerê Xelîcê yê duduyan dewleta Amerîkayê dixwest êdî xwe ji vê sendrom û traumata xelas bike. Roja ku dewleta Amerîkayê li dijî

leşkerên Sedam Huseyîn bi ser ket, Serokê Amerîka George Bush wiha got: "Ev rojeke serbilindiyê ye ji bo hemû gelê Amerîkayê û bi Xwedê em ji sendroma Vietnamê bi temamî xelas bûne." (The Washington post, 2.3.1991. R. A139). Ev şerê Xelîcê ku bi navê Desert Strom dihat meşandin wekî tolhildana Saigonê dihat binavkirin. Li Vietnamê di sala 1975'an de leşkeriya Vietnamê derbeke mezin li leşkeriya Amerîkayê da û Amerîka bi kotekî ji Vietnamê derket. Di şerê Xelîcê de her roj George Bush di televîzyon û radyo de digot ku ev tiştê li

Vietnamê çêbûye, careke din nayê serê gelê Amerîkayê. Ev şerê li dijî Iraqê û Îranê bi piranî bûbû şerê şerê. Kurdîstana Başûr jî, ji bo mirovatiyê tê parastin. Ew wekî filmekê Hollywoodê nimandin. Kurdên belengaz divê werin parastin û lewre ji her azîneyê serbest e. Bi rastî, daxwaza Amerîkayê ne alîkariya kurdan bû. Bi taybetî 'kurd ji bo doza xwe bi kar dianî. Mesele ne meseleya kurdan e, bi taybetî Amerîka li metodên (azîneyên) nû digere, ka çawa kare dewletan çêtir û nermtir kontrol bike. Lewre ji ev parastina kurdan li Kurdîstana Başûr û

şiyên li Iraqê bi navê Operation Provide Comfort metodeke nû ye. Bi navê "alîkariya mirovahî" dewleta Amerîkayê bi livbaziya leşkerî piştgirî û alîkariya rejîmên dîktator dike. Bi navê mirovatiyê di sala 1989'an de kete Panamayê, li Bolîviya û Perûyê, di sala 1989'an de şer kir û bi hûmanîstî di sala 1991'an de kete Somalîyê. Îro jî bi vî navî kurdên Başûr diparêze û alîkariya dewleta Tirkîyeyê dike ku qirkirin li Kurdîstana Başûr dom bikin. Kurdîstana Başûr îro ji bo Amerîka û Îsraîl bûye naven-da şerê li dijî têkoşîna rizgariya Kurdistanê û gelên dinyayê. Ew dixwaze şerê xwe li vir organîze bikin û bimeşînin.



# FAL



## BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Ev demeke çî ji were tê gotin hûn li berovajî wê hereket dikin. Ev yek, dilê dê û bavê we û yê hevalên we dişkîne. Dema ji were 'here aş' tê gotin, hûn diçin aşvan dikujin. Ev yek, ne bersiva pêdiviyên we dide û ne jî di berjewendiya we de ye.



## GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hûn xwe gelekî zana dibînin û henekên xwe bi kesên derdora xwe dikin. Lê jibîr nekin ku dema aqil derxistine firotanê hemû kesî aqilê xwe kiriye. Henekên xwe bi xelqê nekin. Yê jî we bi aqiltir jî hene.



## CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Van rojan bêhna we gelek teng e. Ji ber vê bêhtengiyê jî, hûn tiştên wekî mû dikin wekî werîs. Gereke hûn dev ji vî exlaqî berdîn. Dema aş çû, mirov bi pey şeqşeqê nakeve. Tiştên çûyî meriv bi dûv nekeve.



## KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Mirov carinan bi a xwe dike û carina jî bi a dilê xwe dike. Ev demeke hûn zêdetir bi a dilê xwe dikin. Lê, divê mirov tu car gotina aqilê xwe jî paşçav neke. Bi rastî jî gotina dil û ya aqil bi hev re ye.



## ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Karê we baş e. Tu kêmesiya we tûne. Lê hişê we tim li welatê we ye. Raste, bilbil xistine qefesa zêrîn dîsa gotiye: "Ax welatê min" Hûn jî ji bo vegerin welatê xwe bixebitin. Xebata jî bo welat pîroz e. Zêdetir bixebitin.



## SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Rast e, ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştêk tune. Lê ji bo serxwebûn û azadiyê jî xebat lazim e. Divê mirov tu car nebêje xebata min bes e, ji min ev tê. Gerek xebat her tim zêdetir be. Ne xwe nabe.



## MÊZIN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Dev ji vê dilzîziyê berdîn. Ev çî ye? Bi tiştêkî biçûk mirov dikare we bi rojan bixe mitala. Dilzîzî mirov bedew û şîrîn dike. Lê ne bi awayê we. Divê hûn dilzîziya xwe biparêzin, lê xwe nekin esîrê dilzîziyê jî. Ya baş bi dilzîziyê re realîzm e.



## DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Hûn xwe li ser sebebên tiştan dîn dikin. Lê ji bo çareseriyê jî tiştêk nakin. Mirov li ser teferûatê xwe dîn jî bikin nikare tu tiştî bigûherîn in. Çî gotine pêşiyên me, çemê Muradê çiqas rabe nikare bi qulingê tiştêk bike. Ji bo çareseriyê bixebitin.



## KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Di jiyana herkesî de astengî û zehmetî hene. Ya mihîm ew e ku mirov karibe li ber astengan bisekine. Dema mirov li ber astengan sekinî û çareser kir mirov biser dikeve. Ji bîr nekin, hevraz bê berjêr nabe. Dawiya tengasiyan rojên firehiyê ne.



## KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Divê mirov bi qasî ku li mal û canê xwe xwedî derdikeve li yê dostên xwe jî xwedî derkeve. Gotina, "Tu ji bo xwe çî dixwazî, ji bo birayê xwe jî wê bixwazî." Wê yekê li ser mirovan ferz dike.



## DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Êdî dev ji vê pesindanê berdîn. Bihêlin bila xelq pesnê we bide. Dema hûn li civatekê pesnê xwe bidin û rabin, ihtîmaleke mezin wê ev gotin li pey we were gotin: "Gundê bêrez, konê bêpez, mirovê ku bêje; ez û ez ji çî re ye?"



## MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Dilê kesî ji xwe nehêlin û nebêjin; ew kî ye? Dema dilê xelqê ji mirov bimîne, dibe ku dijminatîya mirov jî bikin. Hezar dost kêmin dijminêk zêde ye. Gere ev gotin ji guhê we re bibe guhar û hûn li gorî vê gotinê gav bavêjin.

# Hey lê lê hey lo lo

Kurdek û tirkek, her dük jî li qereqolekê cendirme ne. Rojekê her du bi erkeki diçin gundekî. Di rê de yê tirk ji xwe re; çima ez sûtê ji ev kurd nabînim. Divê ez wî bixapînim; dibêje.

Bi vê armancê ji yê kurd re dibêje: Hemşerim, çima em herdu bi rê ve diçin. We-re emê bi dorê li kolîka hev suwar bibin. Yê li kolîkê, bila stranekê bibêje, heta ku strana wî dawî bê. Paşê bila yê din suwar bibe.

Yê kurd jî vê daxwaza yê tirk herê dike û pêşî yê tirk li kolîka yê kurd suwar dibê, heta ku strana xwe dawî tîne. Lê, ji ber ku strana tirkî kurt e, di sê çar deqîqan de dawî tê, vêca dora yê kurd tê. Yê kurd, li kolîka yê tirk suwar dibê û bi hey lo lo, hey lo lo dest bi strana xwe dike heta ku bi hem-



berî gund dikevin. Yê tirk lolo dawî hat, vêca dora gelekî zivêr dibê û dibêje: heye lê lê, hey lê lê ye. Ma qey nema dawîya hey lo lo têt? Yê kurd: Belê, hey

GELÊRÎ

# Zava û Mele

Li gundekî gencek dize-wice. Govenda yê genc têtê kirin, vêca, dora mahr birîna wî têtê û wî dibin cem mele. Mele jî yê genc dipirse: Kurê min, şertê îslamê çend in? Yê genc: Deh in seyda; dibêje. Mele "na" dibêje. Yê genc, pa bîstin. Mele

dibêje "na". Yê genc di dawî de "Sed û pincî ne" dibêje. Mele jê re dibêje: Here xwe hîn bike û paşê were. Li ser vê yekê zava vedigere malê û bavê wî jê dipirse: Te çawa kir kurê min? Zava: Bavo, mele pîrsa şertên îslamê ji min kir, min jî nezanîm.

Wî jî ji min re got; her xwe hîn bike û were... Bavê wî dibêje: Şertên îslamê pînc in kurê min. Kurîk dibêje: Min sed û pîncî got mele qebûl nekir, vêca wê çawa pîncî te qebûl bike!.

ZEKÎ BAZIDÎ



## Roviyê Axê

Rojekê axayekî Şîrnexî bi xulamekî Rxeve ve diçih nêçîrê. Roviyekî li ser rîya xwe dibînin bi dû dikevin, lê tu elacî jê nakin. Piştî wê tîna malê, êvarê li koşkê, axa behsa nêçîra xwe ya wê rojê dike. Axa dibêje civatê: "Îro em çûbûn nêçîrê, me rûvîyek dît. Bawer bikin dûtê wî ji vir û Mûsilê dirêj hebû. Gazî dike xulamê xwe dibêje: "Li ser bextê te xulam ma ne wiha bû"

Xulamê :  
- Welleh axayê min ji vir û Mûsilê tu nebû! Lê ji vir û Xaxoyê hebû.  
Axa li ser vê xeberê aciz dibê, dibêje:  
- Malkembax, nexwe bibêje dûtê wî qut bû.

MISTEFAYÊ CIZÎRÎ

## Ay piştî min

Mirovek hebû her tim di nav rezê xwe de ka-Mrê xwe dikir û bi şev jî di nav rezê xwe de dima.

Şevêkê diz tîna dikevin nav rezê mîrik. Ên xwarin ji xwe xwarin, ên mayî jî helikandin mên-wên wî ji reh anîn der û tîra mîrik lîxistin. Li ku dera mîrik bixistana, mîrik digot: "Ay piştî min." Diz rawestiyên û jê re gotin: "Lawo çima em li zikê te dixin tu dibêji ay piştî min? Sedema vê çî ye"

Xwediyê rez dibêje: "Belê rast e ji bo ku ez bêpişt û pal im. Min kesê xwe nîn in ku piştî min bigirin. Eger ez bi kes bûma we ne dikarî bêne hem rezê min qut bikin û hem jî li min bixin..."

RÊBER RONÎ



# Apê Mûsa bi wan hesiyabû

Di salên şestî de, Dev çepên tirkan ku bi şoreşê re xiniz in, wekî Çetin Altan û İlhan Selçuk, yekî di rojnameya Akşamê de yê din jî di rojnameya Cumhuriyetê de bêrawestan li ser sosyalîzmê û rêberîya wê dinivîsandin. Wekî du teyrê dubirak bûn, pesnê hev û din didan. Pêşengiya şoreşa Anatoliyayê dikirin. Em xortên pêşverû me gişan nivîsên wan dixwendin û em li ser şopa wan diçûn.


Ji aliyê din ve civateke me hebû û di wê civatê de pêşengên me, yên sosyalîst û welatparêz hebûn mîna: Musa Anter, Yaşar Kaya, Edip Karahan, Canib Yıldırım, Örfi Akkoyunlu, Medet Serhat û hwd. xwendevanên kurd ku ji Kurdistanê dihatin Stenbolê, berî her tiştî nivîsên Çetin Altan û İlhan Selçuk dixwendin û dibûn sosyalîstên navneteweyî (internasyonal).

Doza welat û niştîmana xwe ji mejiyê xwe diavêtin. Ji ber ku têkilî û pêwendiyên me bi wan pêşengên

**Di civata me de pêşengên mîna: Musa Anter, Yaşar Kaya, Edip Karahan, Canib Yıldırım, Örfi Akkoyunlu, Medet Serhat û hwd. hebûn. Xwendevanên kurd ku dihatin Stenbolê, berî her tiştî nivîsên Çetin Altan û İlhan Selçuk dixwendin û dibûn sosyalîstên navneteweyî.**

welatparêz re hebûn, hinek welatparêzî bi me re mabû. Xortên kurd ên sosyalîstên navneteweyî di civatê û civînan de rexne li welatparêziya me digirtin. Digotin: "Hûn welatparêz, zimanparêz û nijadperest in. Hûn paşverû ne. Di demek kurt de dê sînor ji nav welatan rabîn, her tişt bi sosyalîzma Çetin û Selçuk dê bê çareserkerin. Ji bo rizgariya kurd û Kurdistanê tu têkoşîna lazim e, wê xweber hel bibe."

Di wê demê de pirtûkên pêşverû û li ser rizgarkirina gelên bindest hatibûn nivîsan-



bin, bi zimanê tirkî bûn, lê ku tene Stenbolê ew xortên delal tene guhartin. Bi texmîna min tiştin wan berevajî dikin. Hinek wan serûbinê hev dikin. Li ser vê ramanê tu çi dibêjî?

Wî got: - Wekî kê? - Wekî Çetin Altan û İlhan Selçuk, xortên kurd di çerxa wan de tene pişaftin û guhartin. Min dît çavên wî leyistin û got: - Na lawo na, Çetin Altan û İlhan Selçuk mirovên pêşverû ne, xizmeta me dikin, li wan ewle bin, em û wan di şopekê re dimeşin, hevrê û heval in.

-Wele ez bi wan ne ewle me, dibe ku riya me jî ne yek be.

-Ka jî min re şirove bike. Bi çi gumanê?

-Ez nizanîm. Ji ber ku ez nizanîm min jî te pirsî.

Wê rojê me tiştek nexist serê hev. Lê min temîn kir ku di serê wî de jî bû pirs.

Roj bi roj rewşa me xerabtir dibû. Em giş endamên FKF'ê (Fikir Klubleri Federasyonu) bûn û em bi dil û can tê de dixebitîn. Lê her bala min li ser wê ramanê, li ser wê pirsîrêkê bû. Di sala 1968'an de, wekî her car ez û hevalê xwe Dr. Burhan Veli Yaşar çûn dikana Aşık İhsanî, İhsanî jî me re qawînê Saliho Pismamo danî ser gramfonê û got: "Hûn li strana min ya nû guhdar bikin, ezê pirtûkên nûderketî jî we re bipêçim. Va ye pirtûkeke Mao derketiye, navê wê "Yeni Demokrasi" ye.

Min pirtûk xwend

ku bersiva ramana min û pirsîrêkê me giş di wê pirtûkê de ye. Mao dibêje "Rizgariya civakan di du merhaleyan de pêk tê. Ya pêşî rizgariya neteweyî û ya duyemîn rizgariya aborî ye. Heta rizgariya neteweyî neqede ya aborî çenabe. Ango rizgariya aborî piştî ya neteweyî dest pê dike." Min pirtûk xist bin cengê xwe û berê xwe da Suadiyeyê mala Xalê Mûsa.

Xalê Mûsa li bexçe rûniştiye, berga pirtûka Mao di destê wî de spî dike û dixwîne. Çav li min ket, pirtûk danî ser maseyê, rabû pêrgî min ve hat û got:

-Doktor ka ez eniya te maç bikim.

-Çima, xal?

-Va ye bersiva pirsas te Mao daye. Erê navê me yek e, em her du alî şoreşvan û têkoşer in, lê şoreşên me jî hev û din cihê ne. Em di şoreşa yekemîn, ew di ya duyemîn de ne.

Ji wê demê ve, şoreşgerên tirkan dagirkeriya mejiyê xortên kurdan dikirin û ji wan bê, wê hîn jî bidomînin, lê êşkere bûne. Ma wê kî li wan ewle bibe. Va ne rasterast nijadperestiyê dikin. Ango sosyalîstên nijada xwe ne, qaşo nasyonal sosyalîst in. Apê Mûsa jî gorê serê xwe rakiribûya û li rewşa wan binihêriya wê tû bikiriya rûçikê wan î belek. Apo di nivîseke xwe yî dawî de gotibû: "Ez dikarim Çetin Altan efû bikim" Ango bi durûtiya wan hisiyabû.

Î. OMERÎ

Yên berî me çi, çawa dinivîsandin?

## Ji dîroka rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 6. a Kovara Ronahî  
Mêjû: 1942, 1'ê rezberê

### Difin û guhên xwe dane jêkirin

Daryûş, şahê Faris jî bîst mehan de Babil mihasere kiri bû. Dikir ne dikir midafihên kelehê bi tu awayî teslîm ne dibûn û li ber xwe didan. Dawî, Daryûş qerara xwe da û got "Em jî emê weke Siryûs bikin û li hêviya wê rojê bimînin ko Ferat cowa xwe wê biguhêrine û di coke din re wê biherike"


Lê ev tişt carina li serê du sê salan û carina jî di bîst an pêncî salî de carekê diqewimî. Zobîrûs ferman-darekî Daryûş gote şahê xwe: -Ezbenî, em çawan karê xwe li hêviya şans û siûdê bihêlin. Tu difin û guhên min bide jêkirin ezê heta çend rojan deriyên bajêr ji ordiwa te re vekim.

Daryûş difin û guhên Zobîrûs dane jêkirin. Zobîrûs di vî halî de çû Babilê. Xelk lê kom bûn û mesele jê pirsîn. Zobîrûs jî wan re da zanîn ko Daryûş lê hate xezebê û difin û guhên wî jêkirine û ji ber vê yekê ew jî hatiye cem babiliyan da ko heyfa xwe ji Daryûş hilîne.

Zobîrûs kumandarekî bi nav û deng bû. Babilî bi hatina wî şa bûn û ew xistin şewra xwe. Zobîrûs jî wan re planek çêkir. Li gora wê planê eskerên Babilê wê ji kelehê derketana û dirêjî ordiwa Daryûş bikirina û ew bişikestana. Ev bi xwe, îşekî zehmet bû. Lê ji bo Zobîrûs hêsanî bû. Ji ber ku Zobîrûs rewşa ordiwa Daryûş bi her kitkitên wê nas dikirin.

Babiliyan serfermandariya eskerên xwe siparte Zobîrûs. Zobîrûs teqîr ne kir, ji ker ve, Daryûş li plana xwe serwest kir û şevêkê deriyên kelehê vekirin; lê li şûna ko babilî dirêjî ordiwa Daryûş bikin, Daryûş bi ordiwa xwe kete hundir û bi behayê difin û guhên kumandarekî xwe î canfeda Babil zemt kir. Herçi Zobîrûs bi vê fedakariyê di tarîxê de bû qehremanekî abadîn.

CELADET BEDIRXAN






Ji başûrê biçûk (beşê Sûriyê) hunermend Nîhad Gulê:

# Cîhana tabloyên min cîhaneke dogehî ye

"Hunerê kurdî di vî beşî (wênêkêşî) de gelekî navdar e û ev navên tê gotin, sitûnin girîng û bêdeng in. Navên wan gihîştin heta bi ferhenga hunerî ya cîhanê. Erê dibe ku dibistanêke hunera kurdî hebe di hêla rengan de; rengên kurdî, dijatiya rengan bi hev re, rengên sarûgerm bi hev re. Cîhana tabloya kurdî herdem tijî êş û xerakirin û xemkêşî û talanên mezin in. Ev û tiştine din hiştin ku hunerê kurdî li vir cih bigre, ne li Sûriyê tenê belê li cîhanê bi tevayî."



## PORTRE / NÎHAD GULÊ

Sala 1986, xwendina xwe di enstituya "Fethî Mihemed" ya hunerî li Helebê kuta kir.

Sala 1987, bû xwendevan di fakulteya hunerî de li Şamê, lê berdewam nekir.

Endamê komela hunermendane li Sûriyê beşê Helebê. Pêşengeyên ku tê de beşdar bûye:

Pêşengeya xwendevanên hunerê (1958) li muzûm (methef-kevnegeh) Heleb.

Pêşengeya li zankoya Helebê (1990).

Pêşengeya komek hunermendên ji Sûriyê (1991) -Salona Îbla- Heleb.

Mihricana Buhara Helebê (1992.93.94.95) -Salona Tişrîn-

Pêşengeya hunermend û kevnegêşan, li Salona Tişrîn- 1992

Mihricanê Buhara Helebê (1995) -li Lazîqiyê.

Pêşengeyek bi tenayî (1996) -Salonek Taybetî-...hwd. Niha Nîhad li bajarê Helebê rûniştiye.

Huner û edebiyata kurdî, hêdî hêdî li her çar parçeyê welêt belav dibe. Li kîjan parçeyê kîjan hunermend hene, bi çi meşxûl dibin, çi dikin û çawa dikin, hem bala me û em wer bawer in ku hem bala xwendevanên me jî dikşînin. Ji ber ku kurd di van waran de birçî û tî ne. Bi salan e welat bi sînorên bêoxir ji hev hatiye veqetandin, ev

jî bi xwe re bêagahiya di navbera van parçeyan de tîne. Heta ku ji destê rojnameyê bê û li gorî (di nav) îmkanan emê ji her parçeyê hunermend û edebiyatvanan bidin nasîn û der barê huner û karên wan, xwendevanên ronî û agahdar (-ji devên wan-) bikin.

Vê hefteyê jî emê hevpevîna ku nivîskar Evdîlhelîm Yûsif ji bo

me bi hunermend Nîhad Gulê re kiriye, pêşkeşî we dikin.

**NÎHAD GULÊ kî ye? Bi vî pirsê ku tim di destpêkê de tê zîmên, emê jî dest pê bikin?**

- Ez ji Efrînê, gundê "Enqelê", di sala 1968' an 7'ê avrêlê de ji dayi-

kê bûm. Erê di wê rojê de dema dayika min ez avêtime vî dinyayê ez giriyam û heta vî gavê ez digrîm; bêyî ku ezê zanibim çima. Ez bi girî hatime dinyayê û ezê bi girî herim. Piştê mîna her zarokê ji gund dema toz û talanê dest pê kir, xwas û tazî diçûm dizya tirî û hejîran û tu çêlik yê çûkan ji me ne di fîlîtin.

Tê bîra min, tê bîra min, rojên baranê, min li ser heriyê wêne çêdikir ruwên mirovan, turmbêl.., Li dibistanê hevalên min ez bi xwe hestkirim ku ez wênesaz im, ev tişt bi min re mezin bû li gel tembûr û hellbestan, gelek şax bi hev re di dilê min de şîn dihatin. Wêneyê yekemîn ku min çêkir, wêneyê keçikeke xweşik bû, min bi dîwêr ve daleqand, lê gava ez ji dibistanê vegeyriyam min dît ku bavê min ew wêne qetandiye û pûtê kalekî ji heriyê min çêkiribû, ew jî şikandibû. Pê re hestê nabûnê di hundurê min de mezin bû, ku divê ez wêneyekî nû û pûtêkî nû çêkim û divê bimînin.

**Emê bîna qonaxekedin, tîkiliyên te bi reng re bi çi şeweyî (destpêka ku rengan tu dan ber pêlên xwe) avabûn?**

- Temenê min heşt neh salî bû dema em hatin bajarê Helebê. Ez jî heta qirikê di nav ava biyaniyê de mam, her tişt nû bû; sikak, xelk, avayî, ezman. Mamoste li dibistanê li navê min dipirse, ez jî behetî lê dinêrim, gelo ev çi dix-



"Mamosteyekî digot: Rengên te, kesên te, ji dûr dûr ve dikin qêrîn û dibêjin tu kurd î."





weze? Şagirt jî bi min dikenin, zarokên ereban dikeniyên... belê ez jî digiriyam, kela girî jî qirka min dernediket, bi min dikeniyên, ji min aciz bûn çimkî ez zarokêkî kurd bi tenê di nav koma wan de bûm.

Lê di fêrên hunerê de min wêne ji wan re çêdikirin, ew jî -ji bo vêhêdî hêdî bi min re bûn dost û aniha jî ku tu li tabloyên min dinêre rûçik tev de gundî ne, diya min bû, pîrka min bû û rengên min ji yên cilên wan in yan yê tejk û cilên wanî ku li ser erdê radixistin tev rengê buhara gundê me, ev tişt tev de, di hinavê min de û di tabloyên min de cih girtin. Heta rojekê yekî ji mamosteyên enstituya hunerê li pêşengeya Zankoya Helebê digot: Rengên te, kesên te, ji dût dût ve dikin qêrîn û dibêjin tu kurd î. Hinekan ev kêmanî didît, lê ji min re ev tişt cihê serbilindiyê bû û ez kêfxweş im ku agirê van rengên dojhî tim di ser û dilê min de teze û jîndar e.

**Çi helwestên girîng di jiyana te yî hunerî de hene, heta vê demê tu kare hinekî vê babetê bide şîrovekirin?**

- Bi dû qonaxa rastgiriya (Elwaqîye) de ez pir ji intibaiyên (tablogirî) Frensî ve nêzik bûm wekî Van Gog, Sîzan, Monyê û Rînwar û akamên xweyî hêjayî li ser min hiştin. Lê bêtir ji tevdan Van Gog û Sîzan. Ez pê hestbûm ku Van Gogek di hinavê min de ye, heta demekê ez li ser rêka wan bûm. Lê dût re min wêne saz dikirin, min tablo çêdikirin bêtir ku ez zani-bim pê, bê ez çidikim. Ji ber ku hest û can girîngtirin ji aqil û mejî, her dibistaneke hunerî qeydên xwe bi xwe re tanîn û her rexnevanekî jî ez dixistim rêza dibistaneke hunerî de. Ezê bûyereke pêkenîni ji te re bêjim. Min ji keçikeke yezîdî hez kir. Ji ber ku xudanên wê kêfa wan ji durvê hunermendan re nayê, min riya xwe kur kir, ji bo ez wê bixwazim. Di wê demê de rexnevanekî di şevbuhêrkeke rexneyî



**"Ez nikarim bibêjim ku em li ser eynî rêça wî nîşê yekemîn in, lê ew dimînin mamoste, wan çavên me li ser rengên kurdî vekirin em jî dixwazin -li gor dema xwe-tiştêkî nûjen û hêjayî binin meydana ku zimanê nîşên me be zimanê mîletê me be zimanê dema me be."**

ya li ser hunerê de got, "Em te di bin sika kîjan dibistana hinerî xînin?" Min jî lê vegehand, "Min riya xwe kur kiriyê û ez nizanim bipeyivim."

**Û çî bi keçka yezîdî hat?**

- Min naskir ku em kurd, kêfa me ne ji durvê hunermend tenê re lê ji jiyana û mejiyê wî re jî nayê. Keçka yezîdî, hevalo, baskên wê çêbûn û gihîşt refê xwe. Li gor daxwaza dê û bavê wê ez jî li kurkirina riya xwe poşman bûm û ez vegehiyam giriyê xwe yî pîroz û her bi girî re jî riya min dirêj dibû. Wêneyê min berê li

min vegehiyam, firça destê min dîntir bû û aqil jî nema.

**Dînbûn û tablo, çî pêwendî di navbera wan de hene, ketinheva navbera rengan û cîhana tabloyê çawa û bi çî awayî, bi çavan re dipeyivin û pîran ava dikin?**

- Bi dînbûn û bi girî ez li ber paçkê tabloyê yê sipî radiwestim. Mîna kefen e ew paçkê sipî hêsiyên min tev li rengan dibin û tobloyan min çêdikin, gelek carî mûzîk min dajo, girî min dajo, ji bilî vê min her tişt jî bîr dikir. Li pêşengeyan, min ziq dî-nêrî li xelkên ku bi tirs

hember tabloyên min radiwestiyên û digotin, ev kî ye? Ev çî dixwaze? Ev çî dîn e? Bi tirsê jî li êş û xemên dirû û çavên min de dînerîn, min nedixwest zanibin ku ez xwediyê van tabloyan im, ji bo ez xwe hestên wan bigrim. Hinekan ji dût ve digot: Ev jî xwe re bi xelkê dikene. Ez jî bêtir dîn dibûm û dara nabûnê di hinavê min de bêtir şax vedida. Ez dikarim bibêjim -bi kurtî- ku cîhana tabloyên min cîhanê dojhî ye.

**Taybetiya hunerê kurdî, gelo tiştêkî wisa sazûyê li vê beşî, nemaze zencîra navan di-**

**rêje; Omar Hemdî (Malva), Beşsar Îsa, Fatih Muderris, Înayet Ettar...hwd?**

- Hunerê kurdî di vî beşî de gelekî navdar e û ev navên te gotin, stûnin girîng û bêdeng in. Navên wan gihîştin heta bi ferhenga hunerî ya cîhanê. Erê dibe ku dibistaneke hunera kurdî hebe di hêla rengan de; rengên kurdî, dijatiya rengan bi hev re, rengên sarûgerm bi hev re. Cîhana tabloya kurdî herdem tîjî êş û xerakirin û xemkêşî û talanên mezin in. Ev û tiştine din hiştin ku hunerê kurdî li vir cih bigre, ne li Sûriyê tenê belê li cîhanê bi tevayî.

**Çi tişt we bi hevdu ve girê dide. Nîşê kevn ku ev taybetî damezrandin, heta bi Behram Haco, Zuhêr Hesîb, Xelîl E. Qadir, M.Salih Mûsa, N. Gulê, Reşîd Hisso, Rehîmo, Ehmed Qilêç, Reşad Yûsiv, Nîhad Turk...hwd. Te dît hîn zencîr dirêjtir dibe, çî pêwendî di nav van navên kevn û nû de hene?**

- Ez nikarim bêjim ku em li ser eynî rêça wî nîşê yekemîn in, lê ew dimînin mamoste, wan çavên me li ser rengên kurdî vekirin em jî dixwazin -li gor dema xwe- tiştêkî nûjen û hêjayî binin meydana ku zimanê nîşên me be, zimanê mîletê me be, zimanê dema me be.

**Kes di tabloyên te de tim di rewşeke koçberî de ne, herdem koça xwe bar dikin û hêdî hêdî ber bi durbûn û tunebûn de diçin. Çi bi dû vê rewşê de ye?**

- Dibe ku ev hest di kûraniya dilê min de be ku tim berê min li cihêkî dût e, ez windayî me, ez dûtikevim ji xwe û xelkê, ez surgun dibim, biyanî dibim, dimrim. Ev ne bi destê mirov e, ez bi xwe nizanim ku ez li ku me, çima hatime dinê, cihê min li ku ye. Çûn û hatina di vê xelkê de bêdawî ye.

**HEVPEYVÎN: EVDILHELÎM YÛSIV**



# ARGK, şerê xwe yê li hemberî artêşa tirkî û PDK'ê berfireh dike

**D**u baregahên girîng ên PDK'ê, Sersingê û Bamernê jê hatine standin

Qerargeha Navendî ya ARGK'ê encama operasyona bi navê "Welatê Rojê" ya 15 rojan daxuyand. Li gorî daxuyana 182 êriş pêk hatine, 39 girên stratejîk digel 35 sengeran ji hêzên PDK'ê hatine standin.

Ji aliyê din ve ARGK'ê di daxuyaniya xwe ya nivîskî de jî der barê PDK'ê de wiha dibêje: "Ew, an wê Kurdistanê bi temamî berdîn, an jî wê xwe biavêjin bextê dadmendiya gel a şoreşgerî"...

## Botan

**8.9.1995-** Hêzên ARGK'ê li devera Şirnexê li navenda navçeya Qulaban bi ser bineciheke leşkerî de digirin û di encama şerekî tund û dirêj de, bîyî ku gerîla ziyaneke bide astsubayek û 4 leşkerên dewleta tirkî tene kuştin.

Her ev hêza gerîla, di vegeerê de li ser devê rîya xwe bi topên dûravêj gundê cerdevanan Nîreyê mawey demekê topbaran dikin û di encama vê topbarankirinê de 5 cerdevan bi navên Mihe-

med, Nadîr, Emer, Kerem û Cîhangîr tene kuştin û hate zanîn ku gelek ji cerdevanan jî birîndar bûne. Her wiha şervanên ARGK'ê 5 cerdevanan jî digel xwe dibin.

## Zaxo/Amed

**11.9.1995-** Ji layê Yekemîn Tugaya Birûskî ya Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ve ku li dijî hêzên PDK'ê berî bi 17 rojan bi navê "Bizava Welatê Rojê" dest pê kiriyê, bilançoya 15 rojên destpêkê diyar kir.

Bilanço bi vî rengî ye: Encama 182 êrişan, digel standina 39 girên stratejîk, 35 sengeran (qereqolan) ji hêzên PDK'ê, 276 kes ji PDK'ê û 21 kes ji PKK'ê bi tevayî 291 kes hatine kuştin û ewqas jî birîndar hene. ARGK'ê ragihand ku wê



berdewam be li ser berfirihkirina êrişên xwe û xwest ku hêzên PDK'ê teslîm bibin.

## "An here, an teslîm bibe"

Ji bilî vê jî, digel nîrxandina operasyona Başûr ya 15 rojên destpêkê ARGK'ê, hevkarîya hêzên PDK'ê û yên artêşa tirkî bi "tomarkirina xiyane" daxuyakir û ev bangawaziya dawî arasteyî PDK'ê kir:

"Li ber van çeteyan

du rê hene: An wê Kurdistanê sermedî (ebediyen) berdîn, an jî wê xwe teslîmî hêzên gerîlayên me bikin û wê xwe biavêjin bextê dadmendiya gel a şoreşgerî. Artêşa me ya rizgariya gel, biryara xwe ya misoger daye ku ji bilî van her du rîyan li ber vê şebeka xiyane" sêyemîn rê nîn e. Ev welat, çî dibe bila bibe, misoger wê bê rizgarkirin. Li ser vê bihuştta rûzemîn ku bi destê dijmin û xayinên navxo-

hêza xwe berdewam bike."

Sersing û Bamernê jî PDK'ê hat standin.

## Zaxo/Amed

**11.9.1995-** Di hivdemîn roja "Operasyona Welatê Rojê" ya PKK'ê de, piştî şerê rojekê navçeyên Sersing û Bamernê ku du bineciheyan giring ên PDK'ê bûn, hate zanîn ku bi tevayî ketine jêr kontrola hêzên PKK'ê. Di berdewamiya şerên li Başûr û li Bakur

de 29 pêşmerge, 4 leşkerên tirkî û 4 gerîla mirine. Hate zanîn ku Serokê PDK'ê Mesud Barzanî bi xwe çûye navçeya Şêladizê û zordariyê li gel dike da ku li dijî PKK'ê şer bikin. Dîsa hate ragihandin, gelek kesên ku nexwestine li dijî PKK'ê şer bikin, li ser daxwaza Barzanî hatine girtin.

Li gundê Hîzavayê ku 7 km. nêzikî bajêrê Zaxoyê ye, gerîla êrişî ser senger û çeperên PDK'ê kir. Di encama êrişê de hate diyarkirin ku piştî rûxandina senger û çeperan, 9 pêşmerge bi saxî ketine destên gerîla. Li devera Dêrelûkê jî piştî êrişeke gerîla pêşmergeyek tê kuştin.

Li navbera Bêgova û Kanîmasiyê di encama şerekî de tê ragihandin ku 15 pêşmergeyên PDK'ê hatine kuştin. Li ser rîya Sêrt û Misircê jî, di encama şerê li navbera gerîla û leşkeran de hate zanîn ku gerîlayek miriyê. Li devera Dêrsîmê hêzên ARGK'ê êrişî ser sengerê Aspirekê dikin. Di vê êrişê de hate zanîn ku gerîlayek û 4 leşker mirine.

DEM/Welatê Me

# Serîlêdana DEP'vanan hate redkirin

**B**i guherîna madeya 84'an a Qanûna Bingehîn parêzerên mebûsên DEP'ê Yusuf Alataş û Hasip Kaplan ji bo lêvegerandina mafê mebûstiyê serî li Dadgeha Bilind dabûn. Dadgehê roja 12'yê rezberê ev mijar hilda dest û red kir. Dadgehê bi piraniya dangan biryar da ku guherîna madeya 84'an bandorê li rewşa mebûsên berê nake. Lê parêzerên mebûsan ne di heman baweriyê de ne. Li ser biryarê Parêzerê mebûsan Hasip Kaplan dide zanîn ku di hiqûqa cezayî de vegeerîna biryarên di lehê tawanbaran de prensîbeke bingehîn e. Hasip Kaplan diyar dike ku girtina DEP'ê ne ji ber gotin û kirinên mebûsan pêk hatiye, lewma jî pêwîst bû piştî guherîna mafê mebûstiyê li mebûsên DEP'ê bihata vegeerandin. Li gorî Kaplan Dadgeha Bilind biryareke siyasî daye û ev prensîba hiqûqî jî daye bin piyan. Kaplan dide zanîn ku dadgehê bi vî kirîna xwe cotpivaniya xwe jî nîşan daye, ji ber ku ev biryar, lidijî bi sedan biryarên eynî dadgehê ne.

Cîgirê Serokê HADEP'ê İsmail Arslan jî li ser biryarê dibêje: "Ev biryar jî wekî biryara girtin û cezakirina mebûsan biryareke siyasî ye." Li gorî dîtina Arslan politikaya dewletê ya li ser doza kurdî bandorê li dadgehan jî dike. Ew dide zanîn ku



Mebûsên DEP'ê bi derbeya 2'yê adara 1994'an ji mebûstiyê hatin avêtin. Hin ji van hatin girtin, hin jî derketin ewrûpayê.

Dadgeha Qanûna Bingehîn di dema girtina DEP'ê de siyasîbûna xwe nîşan daye û 4 mebûsên partiyê jî yên din veqedandine, ji bo ku hîlbijartina awarte neyê rojevê. Arslan dibêje: "Tevî ewqas belgeyên ku hatin pêşkêşkirin jî dadgehê li dîv daxwaza siyasîyan biryareke bi vî rengî da." Li gorî İsmail Arslan hinek kesên ku aştîyê naxwazin nahêlin ku tu gavên demokratîk bên avêtin. Arslan helwesta hiqûqzanên Tirkiyeyê rexne dike û dide zanîn ku li ser do-

za kurdî bîdengî û cotpivaniyek heye.

Tê gotin ku bi vî biryarê hiqûqîbûna Dadgeha Qanûna Bingehîn jî ketiye gumanê. Li gorî dîtina Hasip Kaplan ev dadgeh li hemberî hemû gavên demokratîk bûye asteng. Parêzerê mebûsan diyar dike ku wan li Dadgeha Ewrûpayê li hemberî Tirkiyeyê doz vekiriyê, piştî vî biryarê îhtimala qezenckirina wan zêde bûye.

Welatê Me/Stenbol

## Welatê Me li dadgehê bû

Xwediye rojnameya me û Berpîrsê Karê Nivîsanê berê roja 11.9.1995'an li Dadgeha Ewletîya Dewletê ya Stenbolê (DGM) îfade dan.

Ji ber nivîsa di hejmara 5'an de, ya bi navê "Em dîsa di govenda serxwebûn û azadiyê de dilîzin" li gorî maddeya 7'an a Qanûna Têkoşîna li Dijî Terorê (3713) doz li rojnameyê hatibû vekirin. Tê îdîakirin ku di nivîsê de propagandaya PKK'ê hatiye kirin.

Xwediye rojnameya me Aynur Bozkurt û Berpîrsê Karê Nivîsanê berê Mehmet Gemsiz di îfadeyên xwe de gotin ku ji ber serbestiya ramanî û danûstandina agahiyên di weşandina nivîsê de mehzurek nedîtine û her wiha daxuyandin ku bi nivîsê propaganda nehatiye kirin.

Lijneya Dadgehê piştî îfadestandinê daxuyand ku pêwîstî bi wergerandina nivîsê li ser zîmanê tirkî heye û ji bo belgeyên din ên dozê temam bibin, doz avêtin 20.11.1995'an.

Li rojnameya me heta niha ji ber nivîsên di hejmarên 4, 5 û 6'an de doz li gorî xalên 6, 7 û 8'an ên Qanûna Têkoşîna li Dijî Terorê (3713) hatine vekirin. Dadgehên rojnameyê (ên Xwedî û Berpîrsê Karê Nivîsan) didomin. Ji bo wan cezayê hepsê û pere tê xwestin.

Wekî ku tê zanîn di danîşîna 6'ê meha pûşperê (heziranê) de Berpîrsê Karê Nivîsanê berê Mehmet Gemsiz jî ber ku bi kurdî îfade dabû, hatibû girtin. Gemsiz piştî 43 rojan di 18'ê îrmehe de hatibû tahlîyê kirin.

Navenda Nûçeyan



# Hindek avdilopên zêrîn

Xiyala aşvanan aş e  
Piştî tirê li min kezîkurê.  
Mala pîrê xweştir e ji  
mala mîrê.  
Rim di karan (tûran) de  
naye veşartin  
Bi destekî du gindor  
(petêx) nayete girtin  
Mar ji pûjanê (pungê) zivêr  
e, çû derê kuna wê de şîn bû  
Ji weliyan dikevin xweli,  
ji xweliyan dikevin weli  
Çêleka rêxok, garanekê  
diherimîne  
Dilê wî diçû goştê kerî,  
digot: Ma ne guhên wî bi ser  
yên kêrgoşkê ve ye.  
Rih dibe bost, lê dijmin  
nabe dost  
Ew bihar e, lê ne ew war e  
Heqê vî destî namîne  
li wî destî  
Devê ku pîvazê nexwe  
bêhn jê nayê  
Heyî be, lawê kerî be  
Mezin casûs in,  
kiçik jê dihewisin  
Mirî ne melûn be, gor lê  
teng nabe  
Ecelê bizinê tê, diçe  
nanê şivanî dixwe  
Sal diçin salan, tèn ser  
sinsilên xalan  
Hemû kes neyarê kewî ne,  
kew bi xwe jî neyarê xwe ye  
Xeta xwar ji gayê pîr e  
Agir di kuçka dijmin de ye.  
Xweş xeber e, lê min  
ne bawer e  
Bilbil kirine qefesa zêrîn,  
dîsa gotiye welat welat  
Sê dîn hene li dinyê; yek  
yê rîya diçite tenê, didu  
yê di ervaziya de vedixwe  
titûnê, sisê, yê malêdibe rex  
malbava jinê.  
Gindorek e û gundek e



Peyvên pêşyan bi sedsalan e ku ji jiyana kurdan a rojane hatine parzinandin.

Gul bi xwe ne tu gul bû,  
nexasim tavîka baranê lê bêt  
Destê nekaritê dê ramûse  
Ji mişkan dikevin hebanguşk  
Dara ser xwe re nebire  
Tu çi bikî karê (kewarê)  
wê ewête xwarê  
Got cotyaro ew çi ye  
tu diçinî got hegi hişin bi tu  
wê bibînî  
Derbekê li mixî dixê yekê  
li diwarî  
Ker carekê dikeve heriyê  
Bexê nêr, ji bo kêr  
De were vî kerî di vî  
borî re derbaz bike  
Çiya ji cihên xwe diçe,  
exlaq ji cihê xwe naçe  
Boriya here bila kûr be,  
riya here bila dûr be, qîza

bîne bila pîr be  
Ma Şam dûr e, mişar jî dûr  
e?  
Yên dizanin ji xwe dizanin,  
yên nizanin mesele  
baqê nîskan e  
Hêbê dike qube  
Dirî li ku dasik li ku  
Destê rihet li ser zikê birçî ye  
Tu nizanî mala girarê,  
tu dest diavêjî heska wê  
Mişk, dikevin heban kuşk  
Helbet qirgê, rî di  
destê me de  
Keko, te jî kun li pîrê dît  
Ma ga dike û ga dixwe  
Xweyê me bû Silo, xwarina  
me bû çilo  
Nanî bide nanpêjan  
bila nanek zêde bit

Piyê xwe li goreyî berga  
bavê xwe dirêj bike  
Ma virka te tilê me de rijaye  
Ji bangurî girantir,  
bi ser çûkê de nayê  
Kîna Cîdu ji kevin e  
Mirîşkê çav li beqî kir,  
gewrî li xwe dirand  
Gotin pisikê guyê te  
derman e, rabû ax rada ser  
Qelî ji sinîkurgan çênabit  
Her teyrek bi refa  
xwe re difire  
Av di gola de genî dibe  
Ne ev e hirç, hêj tu dibêjî,  
ne ev e şop  
Ne nêr e, tu dibêjî bi duş e.  
**BERHEVKAR:**  
**HEMEDOK DILOVAN**

## Kovara Zarokên Agirî

Di adara 1995'an de hejmara wê ya ewilî bi zimanê tirkî derket. Kovar, fotokopî ye û ji 44 rûpelan pêk tê. Kovar ji ber bi fotokopiyê tê derketin, di hundurê wê de jî ji bilî wêneyan, xêzik hene. Di rûpela 43'yan de jî qehremanekî (zarok) bi navê Kado (Qado) heye.  
Li ber navê Kado nivîsek wiha heye: Ew berendamekî gerîla ye. Hejmara 1. der barê meha adarê û bûyerên di vê mehê de qewimîne ye. Hejmara 2'yan 46 rûpel e. Di vê hejmarê de tiştê herî balkêş, xêzikên perwerdeyî ye. Bi riya van xêzikan bala zarokan hatiye kişandin.

Berga rûpela 3'yan ji wêneyên Şeva Çaran pêk hatiye û bi vî sernivîsê hatine binavkirin: Zarokên dîrokê yên dilgeş. Ev hejmar jî wekî yên din bi tirkî ye û ji 34 rûpelan pêk hatiye. Lê hejmara kovara Zarokên Agirî ya 4'an xwerû bi kurdî ye.  
Wer xuya ye tesîra kampanyaya zimanê kurdî di vî guherînê de heye. Berga wê ya pêşîn jî li ser slogana vî kampanyayê ye: Bi kurdî bifikirin, bixwînin û binivîsin. Ci-hêrengiyêke din ya vî hejmarê jî yên din heye, berga pêşîn rengîn e.  
Di pêşgotina hejmarê 4'an a bi kurdî de ev tê gotin: "Xwende-

vanên hêja yên Zarokên Agirî: Ji vî hejmarê şûnde, kovara we Zarokên Agirî wê bi kurdî derkeve. Çima bi zimanê kurdî? Berî her tiştî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe (zîkmakî) mafê hemû gelan e. Ji ber vî yekê me jî dixwest ku kovara we Zarokên Agirî bi kurdî derkeve. Lê heya îro, ji bê îmkaniyan ev çênebû. Ji niha û şûnde dilxweşî û şahiya derketina Zarokên Agirî a bi kurdî emê bi hev re bin. Wekî di pêşgotinê de jî tê diyarkirin, wê ev kovar êdî bi kurdî derkeve helbet xêzika ku qehremanê wî Kado ye, êdî ew jî bi kurdî ye. Ev hejmar jî 34 rûpelan pêk hati-



Kapaxa Kovara Zarokên Agirî

ye. Ev kovara ku ji postê kete destê me, bênavnîşan e. Wer xuya ye ku ev kovar, ji aliyê Dîlên Azadiyê ve tê derxistin.  
**SERWÎSA ÇANDÊ**

## Detewê bizanî zimanî kurdî çend wişey heye?!

Jimare 9'î Oktoberî salî 1971'î rojnamey "Kurdistan" peyda bike, le lapere "6" da wîtarî "Hemû kes bika dengê to biço bin bîjîngê bixwênex we. Le ewê da delê guwaye Erim Serok Wezîranî Tirkîye wityetî: Zimanî kurdî be rastî wacudî niye, ew têkelawêk e le farisî û tirkî û erebî ke be hemûy 3000 wişey kurdî têda niye."

We guwaye ararî wezîrî dadperwerî Tirkîyê wityetî "Zimanî kurdî 8000 wişey heye û le 7 milyon kes ke le rojhelatî Tirkîye da dejin, 5 milyonî kurd e ki 15% î danîşt aranî Tirkîye ye ke le 30% xakî Tirkîye da danîşê." Supas bu rojnamey Kurdistan ke em ji maraney xistine rû, êmeş hendê jimarey tirman la heye: Rojnamey "Yeni İstanbul" le jimarey 6.11. 1960 emey nûsiwe:

"Ew 500 kurdey le Diyarbekir xirawnete bendix- anewe kesanî kone perist in emane elfebay kurdiyan dirust kiridwe, le rastî da hemû zimanî kurdî le 4200 wişey pêk hatiwe, le em 2500 wişey Turkî ye, ewî tiri hemûy erebî û farî ye. Ewaney eme elfebayeyan dirust kiridwe neyantiwaniwe tenya 50 wişey kurdî pê bidozinewe."

Ba tozêkî tirîş bigerêynewe diwawe, bo salî 1932, le ew sale da mējûnûsî Tarik Ali Kamal Walî Erzîncan le kitêbî "Erzincan" da ke le çapxaney "Resimli ay" çap kirawe, le babet zimanî kurdiyewe "deferimwê" (Zimanî kurdî birîtiye le 8428 wişey le emane 3080 wişey tirkî kon û taze ye 2000 wişey erebî taze ye, ewaney le zimanî tirkî da be kardehênren ewaney tiri îranî û asûrî, gûrcî û çerkesî ne, le emane tenya 300 wişey le zimanî kurdî kon wergîrawîn."

Xwêndewar û xwênerî kurdî xoşewîst! Aya êsta le paş em rûnkirdineweze zanî zimanî kurdî çend wişey heye????!

**BEKIR BAHÖZ**  
Ji tipên erebî wergerandiye ser tipên latîni  
Çavkanî: Govarî Nûserî Kurd



# 1903 - Ciwantirîn jiyan - 1984

**Heştê û yek salên dûr û dirêj, westan û rawestan çî ye nezani. Gah digel "Brahîmê Heskê Têlî" dêrîniya zarokên hetavê bo newal û geliyên Agirî dadirijand û gah jî, li goristana Şehîdan li ser gora wan yek bi yek radiwestiya û mîna tavên payizan rondik ji çavan dibarand, dibarand û her dibarand. Carinan jî Mirê xwe, Mirê Botan, Mirê xemgîn û buhagiran ji xwe re dikir peyamber û digel wî ji kurdan re...**

*Ji bona her kesek yarek heye ê min welat yar e Belê çibkim di destê dijmi nê xwîn xwar û xeddar e*

Heştê û yek salên dûr û dirêj, her wekû çavîyek ji kanîkên Serheda, yan jî, çavîyek ji kanîbuharîkên Zagrosan, bi şevan, bi rojan, bêwestan, bêrawestan, li newal û geliyan, li çol û beyar û zeviyan, gah bi Zê re, gah bi Rûşîn re, lê hemî deman bi Xabûrê delodîn re bêserî herikî, herikî...û neçikiya.

*Hezar wek min di vê rê da bi van derd û kulan kuştin Tilisma ser devê gencan di sînge min de reşmar e Heştê û yek salên dûr*



Cigerxwîn tevî kurdnasê Sovyeta berê.

û dirêj, heştê û yek salên rûmet û serfiraziyê, destpêka derbederî, perîşanî û serfiraziyê li Hesara xemgîn der da, li Amûda rengîn şax berda, li seranserê Kurdistanê pîroz reng veda û li seranserê cîhanê deng veda.

*Ev e sonda min jî dilber ku dil her dem li bin destan*

*Ez netirsim ji lêdan û ji zindan û ben û dar e*

Heştê û yek salên dûr û dirêj, li her derê û li hemî gavan, li hemberî hemî rengê sîtem û zordariyan bi şiyaneke bê dawî, bi berxwedaneke bêhempa, çavên xwe ji kesî re neşikand û serê xwe ji kesekî re neçemand. Bi wî zarê xwe yê nazîk û şêrîn, bi wan peyvên xwe yê ku mirovatî ji wan difûriya, heştê û yek salan bênavêbir û bê bêhnvedan şerê xwe yê rûmet û azadiyê domand. Ew bixwe, şervanekî bêsinor bû. Gah li Qorê, gah Li Kûba, gah li Dî-en Bi-en-fu. Gah jî bi 'heval Pol Robson' re, li rûçikê tevaya neyarên mirovatiyê dibarand 'tifû'.

*Li ser her dar li bin rûnim bikim qîrîn heta her kes Ji temara xewê rabit, bibit hozan û hişyar e*

Heştê û yek salên dûr û dirêj kela dilê wî daneket, mîna Firat tim bi kêferat yek çirkê jî çavên xwe negirtin û rane-

ket. Gah li 'Cehnemê û li Axirzeman' bi zarokên rênber û gundiyan re sirûda azadiyê


*"Heta kengî em dimînin bin destên dijmin Geh bi kuştin, geh bi sotin tim tê bîra min" digot.*

Gah bi 'Pîra Torê' re "ji Sêrtê diçû Bêrtê". Gah jî bi 'Salar' re şoreşa Prolaterya dest pê dikir. Carinan dibû 'Şepal' û bi paş heft deryayan diket û 'Stêr'a xwe ji nav lepên hût û nehingan rîha dikir. Carinan jî bi 'Fata Sermezî' re agirê şoreşa pale û cotyaran hildikir û bi piyan diçû ser serê beg û xwefiroşan û dîsa bi wan peyvên xwe yê bi rûmet û nazdar...

*"Ev welat bo çî parçe parçe maye li bin destên neyar? Hakimê xakê te bit yê wek Seîd û wek Beyar! Kurdê bextreş wer şikestî -tim dimînin li çar kenar Kuştîyên heps û zindan, têne wan her tim boks û dar*

*Ev welat heqê me ye, hîna jî ji xew nabîn şiyar Hûn li naylonan suwar in rast e em birçî û xwas Tim xulamokên began e, bê çîra û bê kiras Êwe tank û top û zêr in ê me jî bes çakûç û das Lê riya me ya durust e, ey begên dilrênenas Yên di roja serxwebûnêd, wer bimînin şermezar" ji wan re digot û ew gulbaran dikirin.*

Heştê û yek salên dûr û dirêj, westan û rawes-



Helbestvan, mamoste, folklorîst, zimanzan û dîrokzanê kurd Mele Şêxmûsê Hesarî (Cigerxwîn)

tan çî ye nezani. Gah digel "Brahîmê Heskê Têlî" dêrîniya zarokên hetavê bo newal û geliyên Agirî dadirijand û gah jî, li goristana Şehîdan li ser gora wan yek bi yek radiwestiya û mîna tavên payiza rondik ji çavan dibarand, dibarand û her dibarand.

Carinan jî Mirê xwe, Mirê Botan, Mirê xemgîn û buhagiran ji xwe re dikir peyamber û digel wî ji kurdan re...

*"Begê min, serwerê min ey Celadet Şehê min, rêhberê min xweş edalet Tu binîvsîn dihawarêd selaman Ji dêl min ve li kurmancan temaman*

*Çi kurmancên Enedol û çî Sûrî Çî soran û çî goran û çî lorî Çî gavan û çî sulhvan û çî mîr e Ji dêl min ve li kurmancên Cizîr e" silav û peyam dihinartin.*

Ew, tenha ne şervan û şoreşgerê bêsinor bû di nav tixûbên gerdûna me de. Ew, tenha bi gilî û gazine navxoyî qayil nedibû. Carinan jî berê xwe dida yezdanê xwey pak û dilovan, carinan bi hêvî û bi berger, carinan jî bi şeweyekî bêeman û êrîşker, neçariya xwe, kela dilê xwe jê re dadirijand:

*Di tarîka şeva hîcran, çîraxek sîxet im yarab Ji ser heta binê piyan, bi arek veket im yarab Şev û rojan dinal im ez, zirav im wek hîlal im ez Şkestî rengê dal im ez, di xerqa xilwet im yarab*

*Şev û rojan bi kovana im, digel bilbil dilovan im Enîsê xunçê baxan im, ji gul ez dîr ketim yarab (...)*

Belê, heştê û yek salên dûr û dirêj, ew rûneşt û ranewestiya, her li deşt û bilindiyan, çû û

hat, çû û hat û geriya. Di encam de, dîrî wela-tê xwe, dîrî ronîka çavê xwe, dîrî kanîka dilê xwe, jiyana xwe ya tîr rûmet rasipart. Lê dîsa jî gotina xwe bicî anî û li evîna dilê xwe vegeriya, serê xwe li ser sînga wê danî û bû mêhvanê ser-medî yê Cizîrî û yê Xanî.

(...)

*Li ser her dar li bin rûnim bikim qîrîn heta her kes Ji temara xewê rabit bibit hozan û hişyar e Li bin lingên xwe da dênim serê dijmin wekî dîpîşk Li ber pozê xwe dênim wê gula nûbijkiwî xar e Di govenda me da her kes bi dilşadî bikin dîlan Li şûna hêstirên çavan xweş in gencin cih û war e Ev e soza me jî dilber, heger bimrim di vê rê da Ji vê dinya xweş û şêrîn CIGERXWÎN jî ne bêpar e.*

DILDAR ŞEKO



## Li Venedîkê xelata mezin rejîsorê Vîetnamî stand

Di Festîvala Filman a Venedîkê de rejîsorê Vîetnamî Tran Anh Hung, bi filmê xwe "Cyclo", xelata festivalê a mezin "Şêrê Zêrîn" stand.

Babeta film, li ser dewra serokê Vîetnamî Ho Chí Mîn e. Di film de çîroka mirovekî ciwan, a ber bi şidetê ve çûyin tê hûnandin. Rejîsorê Vîetnamî Tran sî û sê salî ye û berî vî filmî di sala 1993'yan de bi filmê xwe "The Scent of Green Papaya" li Festîvala Filman a Cannes Xelata "Camera D'or" standibû. Ev film di beşê filmê biyan ê herî baş

de jî wekî berendamê Oscarê hatibû rêdan.

Li Venedîkê xelatên din jî wiha hatin belavkirin. Listîkvanê mêr ê herî baş: Goetz Georgê Alman (Di filma Der Totmacher). Listîkvana jîna a herî baş: Sandrine Bonnaire û Isabelle Huppert standin.

Ji hêla din Xelata Jûriya Taybet jî di nav du filman de, "Uomo Delle Stelle" (Rejîsorê Italyanî Giuseppe Tornatore) û "A Comedia" (Rejîsorê Portekîzî Joao Cesar Monteiro) hate dabeş (belav) kirin.

SERWISA ÇANDÊ



Rejîsorê Vîetnamî Tran Anh Hung

## Şeva danasîna Antolojiya Edebiyata Kurdî

Li Tirkîyê ew danasîn pirtûkan an jî ji bo derketina wan amadekirina şevan, ne tiştê ku pir tê zanîn. Ev kar, bi giranî li dewletên Ewropa, hê berî pirtûkê bê çapkirin, hêdî hêdî tê kirin. Ji ber vê yekê di serê hefteya borîn de (11'ê rezber 1995) nivîskar Mehmed Uzun, Antolojiya Edebiyata Kurdî a ku ji bo hazirkirina wê 4 sala xebitiye, bi şeveke wiha, da nasîna. Di şevê de nêzikî 100 kes hebûn ku bi giştî jî hunermend, nivîskar û rewşenbîrên kurd hatibûn.

Ji bo şevê nivîskar Yaşar Kemal, mebûs A. Melik Fırat, jîna Musa Anter Hale Anter, nivîskar û helbestvan Murathan Mungan, nivîskar Altan Tan, nivîskar Faik Bulut, nivîskar-lîstîkvan Yılmaz Erdoğan, Mudurê Têkiliyên bi Gel ê Yenî Politikayê Ramazan Ülek û gelek rojnamevanên din hatibûn.



Pirtûka Antolojiya Edebiyata Kurdî, ji du beşan pêk tê û di hundurê wê de zêdeyî 100 nivîskar-helbestvanên kurd, ji her derê dinyayê tê de hene. Di antolojiyê de ji



1900'î û bi vir de kesên ku di edebiyata kurdî de berhem afirandine, cih digrin.

SERWISA ÇANDÊ

## Kovareke nû: Şano û Sînema

Çanda kurdî, wekî gihayê ku ji ber kevîran derdikeve ye. Bi gotineke din ew hêdî hêdî zîl dide. Lê dikare bê gotin ku giha û ruyê hevdu dîtîye û hevdu naskiriye. Li ser çand û hunera kurdan, li her parçeyê Kurdiistanê hewldan hene.

Li welatên Ewropa kurd, wext ji pêşxistina çanda xwe re jî, bi awakî firehî, vediqetînin. Yek ji van xebatan, derxistina kovara şanoyî û sînemayî, Şano û Sînema ye. Ji ber ku hejmara wê kovarê ya ewil neket destê me, bi derengî be jî em hejmara wê ya duduyan (tîrmeh-gelawêj) didin nasîn. Kovar, li ser navê Weşanxaneyê Jîndan û ji du mehan carêkê tê derxistin. Birêvebirê giştî

Gabar Çiyan û Birêvebirê Karê Nivîsan jî Maruf Yılmaz e.

Di hejmara duduyan de hevpevînek bi sînamegerekî Swêd Lars Ahlander, der barê Yılmaz Güney de hatiye çêkirin. Nivîsên ku di vê hijmarê de hene ev in: Pêşmerge, Partîzan, Gerîla, (Çîrok, İsmail Beşikçi, Amedekirina bo şanoyê: Gabar Çiyan) hevpeyvîn bi Onat Kutlar ku bi Yılmaz Güney re kirbû, ji aliyê Mezher Bozan ve li kurdî hatiye wergeradin. Di şanoya kurdî de jî, berhema Mexdîd Hecî, werger Mehabad kurdî, wergera berhema W. Shakespeare. Romeo û Julîet (beş bi beş tê weşandin) Du berhemên şanoyê (Lokman Polat), Kêki Luyî bona

## ŞANO & SİNEMA



Kovar ji welet gelekî bi dîr li biyaniyê (Swed) derdikeve.

Şên (Tadayox: Zaza Şexmûs-Şanoya Tûto)

SERWISA ÇANDÊ

## DEFTER

### Ferheng pêwîst e lê ne dermanê her tiştî ye



AMED TİGRİS

Ji salên 1980'î bi vir Jve, li derî welat, bi taybetî li Swêdê li ser ziman û edebiyata kurdî (kurmancî) xebateke baş û biber tê kirin. Hêdî hêdî vê yekê tesîra xwe li kurdên ku li welatên Ewropayê yên din jî, dijîn kir. Her çiqas ew berhemên ku li Ewropayê derketin wekî hejmar kêmbin jî, bi riyên dizî û cuda gihîştin welat û metropolên Tirkîyeyê jî. Ew kurdên ku hewesa wan ji ziman û edebiyata kurdî re hebûn, gelek feyde jê dîtin. Weşanên kurdî pişt re hêdî hêdî ji Ewropayê ber bi welat ve nêzik bûn û heta Stenbolê çûn. Bi derxistina rojnameyên Welat û Welatê Me, Nûbihar, gelek pirtûk û berhemên din, weşanên kurdî bi dilê me nebe jî, êdî ketin nav gelê me.

Niha bi destpêkirina weşana televîzyona Medê, zimanê kurdî bi teknolojiya herî modern li welat û li derveyî welat çû mala her kurdî. Zimanê nivîsandin û axaftinê bû yek. Hemû zarava û devokên kurdî derketin holê. Her êvar bi milyonan kurd di mala xwe de, di her warî de, guhdariya kurdî dikin. Kurdên li Kafkasyayê guhdariya yên Bakur, ên Bakur guhdariya ên Başûr û yên Ewropayê guhdariya yên Rojhilat dikin. Devok û zaravayên kurdî êdî tîrên fêmkirin û yekbûna wan çêdibe. Bi rastî niha ji bo hînkirina kurdî seferberiyê mezin heye. Ew kurdên ku bi axaftinê kurdî dizanin xwe hînî nivîsandina kurdî dikin. Yê ku nikarin bi kurdî biaxivin jî hînî axaftin û nivîsandina kurdî dibin. Bi taybetî di nav rewşenbîr û kadroyan de hewldaneke xurt heye.

Ji bo hînbûn an jî rastnivîsandina kurdî, ji hinek materyalan re hewcedarî heye. Ji wan yek jî ferheng e. Mirov çiqas ziman baş zanibe û jî re serdest be jî, di dema nivîsandin û wergerê de, dîsa ferheng pêwîst e. Heta niha ji derî ferhenga D.

Îzolî mirov nikare bibêje bi zaravayê kurmançî ferheng heye. Ev jî ji tunebûnê çêtir e. Ferhenga D. Îzolî ya bi kurdî-tirkî û tirkî-kurdî ku di dawiyê de ji aliyê weşanên Dengê ve hatiye çapkirin. Hem kêmbin e û hem jî tijî şaşî û çewtî ne. Ew di hevpeyvîneke xwe de dibêje: "Min di xebata xwe de, ew gotinên ku li Swêdê di kovar û rojnameyên kurdan de derdikevin, girtin û bi kar anîn." Belê rastî wiha ye, 10-15 sal berî niha dema kurdên li Swêdê jî nû dest bi nivîsandinê kiribûn, gotinên nû çêdikirin, çewt bi kar dianîn. Ew her wiha bi çewtî ketin ferhenga Îzolî jî.

Lê, ew kesên ku niha dest bi nivîsandinê kurdî kirine. Hîn wê dema 10-15 salên berî niha dijîn. Wiha nabe, divê mirov wan tecrûbeyên berê li ber çavan bigire. Belê, niha pêwîstî bi ferhengeke nû û nûjen heye.

Yek jî her gotina ku di ferhengê de heye mirov nikare di her hevokê de bi kar bîne. Li gorî hevokan wateya gotinan jî tîrên guhartin. Lê ew wiha nakin. Çi dikin? Dibêjin tirkîya wê gotinê ev e û ez jî dê kurdiya wê wiha binivîsînim. Mesela gotina "binçavkirinê". Bi tirkî "gözaltı" ye û tê maneya "binçavkirinê." Ev ne bi kurdî ye. Mesela, di kurdî de hem jî "tutuklama" û hem jî ji "gözaltı" re "girtin" tê gotin. Ev prensîb di gelek zimanan de jî wiha ye. Hinek kes li gorî zanabûna xwe dibêjin: "Kurdî bi paş ve maye û tirkî bi pêş ve çûye. Divê em jî bi çêkirina hinek gotinan kurdî xurt bikin." Ev ne rast e. Di zimanê ewrûpiyan de jî rewş wekî kurdî ye.



Şivan pezê xwe ji mexel radike, ber dide mêrgê û pala xwe dide kevirê û ji xwe re li şinkahiya biharê dinêre. Li cihê xwe di xew re diçe. Gava ku hişyar dibe pezê xwe li mêrgê nabîne. Bi lez û bez radibe li derdora xwe digere, lê pezê xwe nabîne. Li cihê pêrgî roviyekî tê û pirsê pezê xwe ji rovi dide:

- Birakê rovi, te pezê min nedîtîye?
- Belê, min pezê te dîtîye. Ez dikarim pezê te nişanî te bidim, lê bi şertekî. Şertê min jî ev e: An tu dê pênc mirîşkan bidî min, yan jî tu dê bihêlî ku ez gezekê li kulîmeka te bixim.
- Şivan, şertê rovi qebûl dike, rovi dide pêşiya şivan û diçin ba pez. Piştî şivan digihe pezê xwe, rovi dibêje:
- Birakê şivan, va ye tu ghiştî pezê xwe, êdî kanê mirîşkên min bide min.
- Birakê rovi, ma li vê çola hanê ezê mirîşkan ji te re ji ku bînim. Were gund ezê mirîşkên te bidim te.
- Birakê şivan, ez nikarim bêm gund. Ka ezê gezekê li kulîmeka te bixînim.
- Li ser vê daxwaza rovi, gava ku şivan şalwarê xwe dadixe, ji tirsê dibe

# Tirsa tajiyan ji zikê roviyan dernakeve

qurqura nava wî û rovi jê dipirse:

- Birakê şivan, ev çi deng e ji nava te têt?
- Zû geza xwe li kulîmeka min bixe birakê rovi. Heger na, du çêlikên tajiyan di zikê min de ne ku derkevin çû ji te de.
- Birakê şivan, ez bi qurbana te bîm, tu dê hinekî wan giro bikî heta ku ez hinekî ji vir bi dût dîkewim.
- Her wiha şivan bi bazdan ji cem şivan dût dikeve û nema li paş xwe temaşe dike. Demekê dirêj di ser reva rovi de derbas dike, heta ku rojekê dîsa birçî dibe û derdikeve çolê ji xwe re li neçîrekê digere. Li derdorê gund dîsa pêrgî şivan dibe û ji şivan re dibêje:
- Birakê şivan, tê bîra te ku min berî bi heyamekê qencyek bi te kir-


bû. Tu bi pênc mirîşkan deyndarê min î û a niha ez gelekî birçî me.

- Rast e, ez deyndarê te me. Ser seran û ser çavan. Li vir be, ezê a niha herim gund ji te re pênc mirîşkan bînim.
- Rovi li wir dimîne û şivan jî berê xwe dide

ban. Rovi direve û tajî bi dût ve, bi zorekê xwe ji nav lepên tajiyan riha dike. Hingî ku direve bêhna wî diçike. Piştî bêhnvedanê, gava ku rovi di ber gundekî re derbas dike, dikek wî dibîne û ji tirsê hildikişe ser darekê. Rovi jî tê li bin wê

- Birakê rovi, bi rastî jî baweriya min bi te nayê û ez newêrim dakevim jê, bextê te tune ye.

- Ma tu fedî nakî tu wanî dibêjî birakê dik. Tu ji min re nabêjî tu ji ku ve têtî tu dê bi ku de biçî...
- Baş e birakê rovi, tu ji ku ve têtî, tu dê bi ku de biçî?
- Ez niha ji civînekê têm. Tevaya caneweran kom bibûn û me pêk ve civînekê pêkanî. Di vê civînekê de me gelek biryar standin ku ji îro û pê de, gur û mîh bi hev re biçêrin. Mirîşk û rovi bibin mirovên hev.
- Dik û rovi bibin ap û birazî. Tajî û rovi jî bibin birakên hev û gelek biryarên wiha tê de hatin standin. Îcar were jêr da ez ji serî de ji te re tevî bibêjim û ezê herim bi rêka xwe de.
- Dik nêrî ku rovi bela xwe jê venake. Rawestiya



û li dora xwe temaşe kir. Rovi jê dipirse:

- Te xêr e, tu li çi temaşe dikî?
- Nizanîm. Ji dût ve hinek bi bazdan têt, lê nizanîm çi ne. Belê ez dikarim hinek nişanên wan ji te re bibêjim. Pozê wan tûjik in, çîqê wan dirêj in û navtenga wan zirav e. Niha baş xuya dibin. Heger ez ne şaş im tajî ne. De bila ew jî bêt da em pêk ve ji xwe re rûnin.
- Gava rovi navê tajiyan dibihîze, radibe ser xwe û sivik ji bin darê dût dikeve. Dik gazî dikê û dibêje:
- Te xêr e birakê rovi, çima tu çûyî?
- Hinek kar û barê min heye birakê dik, ezê herim ser karê xwe.
- Ka we civînekê kiribû û biryar standibû ku tajî û rovi bûne birakên hev.
- Ya baş ez herim bi riya xwe de. Dibe ku wan jî wekî te nebihiştibe ku me civînekê kirîye.
- Hey gidî kone. Jixwe jî belaş negotîne ku "ne ji tirsê tajiyan bûna wê rovi li nav sûkê bigeriyana." Bila tu vê baş zanibî ku tirsê tajiyan ji zikê roviyan dernakeve.
- Gotîneke pêşiya heye, dibêjin: Tirs, mêrga roviyan e.

BERHEVKAR  
ABBAS ALKAN

## D Î T Î N Î R A M A N

### Împeratoriya Osmanî

Împeratoriya Osmanî bi darê zorê gelên Rojhilata Navîn dagir kirin. Li ser gelên deverê mîna ereb, faris û kurdan qetlîam pêk anîn, heta ku ew xistine bindestên xwe. Ev gel heft sed sal koletiya tirkên kirine, hîn jî dikin. Lê ji bîra ereb û farisan çûye, ji bîr kirine. Tema-mî ereban, di Şerê Cîhanê yê yekemîn (1914) de teze ji bindestên tirkên faşîst derketine. Gelo çiqas şehîd dan heta ku azad bûne?

Osmaniyan wê hengê ola îslamê ji xwe re kiribûn maşe û mirtal. Bi navê dîn millet dixapandin. Dema ku ereb ji bindestên wan derketin, di cih

de dev ji tîpên erebî û dî-nê îslamê berdan. Gotin: "Em ewrûpî ne." Ew ji bo xwe gelek qurnaz in û ji dinyayê baş fêhm dikin. Ji niha û pê de, divêt rûyê wan bê eşkerekirin, da dinya jî wan baş nas bike, da kes êdî bi wan nexape. Niha TC. dibêje "Em ewrûpî ne", lê nerast e. Dixwazin ewrupîyan jî wekî misilmanan bixapînin. Dema ku ewrûpî ji wan re dibêjin mafê mirovan bidin, bibin demokratîk, bersiva wan ev e: "Em demokrat in û mafê mirovan li ba me gelek heye." Ji hêla din ve çîroka Bosna-Hersekê tînin holê, da wekî çîroka mafê mirovan bête jibîrkirin.

Ev, yekemîn împeratoriya wan bû. Duyemîn împeratoriya wan jî 'Türkî cumhuriyetler'e. Yanî, ji rojavayê heta bi rojhilatê ye. Yanî tirkên Bulgaristanê, Azerbêcanê, Ozbekistanê, Qezakistanê, Turkmenistanê û ev

hemû duyemîn împeratoriya saz dikin û haya dinyayê jî jê tune ye. Dinya û alemê dixapînin. Rûsya jî dengê xwe dernaxîne. Gelo kê ev komarên han çekirine û kî vî mafî dide wan? Helbet Rûsya ev maf daye wan. Wan jî ev ji bîr kirine û dibêjin: "Em tirk in û emê biçin ba tirkan, ji ber ku Tirkiye birayê me yê mezin e." Rûsya jî, tevaya mafê wan bexwîn da wan û ew jî bûn birayên tirkan. Li vir ez şaş dimînim ku çawa dewleta Rûsya dengê xwe nake.

Vêca birayên delal, ne hûn (Welatê Me) û ne jî Med TV, der barê vî tiştî de tiştêkî nabêjin. Em Kurd, bi zimanê xwe yê zikmakî ku Xwedayê mezin daye me, xwendin û televizyonê dixwazin; tirk qebûl nakin. Me dikujin, me ji welatê me derdixin û ji me re dibêjin hûn "terorîst" in. Em mala xwe, welatê xwe

dixwazin, li ser mala me, li ser welatê me rûniştine û ji me re dibêjin: "Hûn derkevin ji welatê me" û li ser vê yekê dinya jî deng ji xwe nayêne. Gelên dinyayê çûne ser heyvê, em jî hîn birakujiyê dikin. Êdî bes e, ji me re şerm e. Her kes bi me dikene. Xwedê tifaqê bide.

MELE DILBIXWÎN

### Seyê revok

Rojekê li gundekî Kurdistanê du mirov bi navên Ehmo û Evdîlxaliq pev diçin. Ehmo, mirovekî belengaz e, lê Evdîlxaliq pir şerxwaz e. Ev her du gundî bi hev dikevin. Ehmo pir li Evdîlxaliq di-

xe û jê re dibêje: "Bela xwe ji min veke."

Lê Evdîlxaliqê gewr ranaweste. Gundî têt wî ji nav destên Ehmo derdixin, lê dîsa ranaweste û bi ser de jî dibêje: "Kuro min berdîn, ezê îro wî bikujim." Gundî gelek jê aciz dibin û dibêjin: "Ka wî berdîn, hema çi dîke bila bike." Gava gundî Evdîlxaliq berdidin, ew jî ber bi mal ve baz dide, da tivinga xwe bîne û Ehmo yê belengaz bikuje. Gundiyek dibêje: "Dev jê berdîn. Gundî lê vedigerînin û dibêjin: "Çû tivinga xwe bîne da Ehmo bikuje." Yê gundî dibêje: "De hûn zanin, heger bi ya min be hûnê dev jê berdîn, dîsa jî hûn bi kêfa xwe ne." Gundî bi ya yê gundî nakin û bi bazdan diçin mala Evdîlxaliq da wî bigirin û nehêlin tivingê bîne. Gava diçin mala wî dibînin ku Evdîlxaliqê me, li ser tasa mala rûniştîye. Evdîlxaliq çawa çav bi gundiyan dikeve radibe ser piya û dibêje: "Ji

bo-xatirê Xwedê hûnê min bigrin, wê belayek ji destê min derkeve. Yê gundî wilo dibêje: "Seyê ewtek nabe girtek."

Îcar çend meh berê, gurê pîr ê bêdiran Alpaslan Türkes digot: "Min berdîn, ezê di şes mehan de dawîya Apociyan bînim." Hinek mirovan jî digotin: "Weleh wê Türkes dawîya PKK'ê bîne." Serokê giştî yê PKK'ê A. Ocalan, her di wê rojê de wilo digot: "Ev deh sal in ku Türkes bi tevî ordiya xwe ve dawîya me neanî. Ka wî berdîn, hema çi dîke bila bike."

Bi rastî îro em dinêrin ku Türkes û tevî tîmên xwe yê taybet û bi hemû çeteyên xwe ve, li hemberî Apociyan şer dikin, dawîanîna wan li rexekî, êdî nema dikarin li Kurdistanê gavekê jî biavêjin. Belê, em Türkes, bi tevî xayin û qontrayên Kurdistanê ve dawetî ser tasa mast dikin.

CABBAR BARIŞ



# JI WELATÊ ME

ZANA FARQÎNÎ

## Muzeyeke surîştî

Ev axa ku gelê me li serê dijî bi bermahî û xerabeyên dîrokî dagirtî ye. Tê de mirov bi hêsanî li şopên dîrokî rast tê. Belgeyên pê selmîn didine nîşan ku welatê kurdan yek ji jêderka mirovahiyê ye. Kêm dever qandî Mezopotamyayê xwedî zengîniyên maddî û manewî ne.

Rojhilatzan û arkeologên ku li Kurdistanê ger pêk anîne, di pirtûk û nivîsên xwe de rastiyekê destnîşan dikin: Ji bo lêgerîn û vekolînên zanistî welatekî bihuşt e Kurdistan.

Bi rastî jî Kurdistan, muzeyeke servekirî ye. Ev welatê ji çiyayan pêkhatî, bi kel û bircên xwe, bi avahiyên kevnare ku li ser wan şopên hûrî, xaldî, asûr, sasanî, pers, grek, roma, bizans, selçûq, osmanî û hwd. hene, bala gelek lêkolîner û lêgerîneran kişandine. Heman heman li her gundekî Kurdistanê yên li çiyê, mirov leqayî kelekê tê. Ew kelên ku li navsera çiyayên bilind û asê hatine lêkirin,

bêhemdî şatoyên derebegên ewrûpî bi bîra mirov dixin.

Di vê muzeya surîştî (tabîî) de şopên beriya dîrokê jî tene dîtî. Der barê vê yekê de gelek belge hene û zanyarên ku xebatên xwe li vê cografyayê kirine, vê rastiyê diselmînin.

Ji aliyê din ve, ev bermayî ji kîjan nîjadan (qewman) mabin jî, ew îro malê kurdan in. Malê wan kesan e ku li ser rûyê vî xakî dijîn. Me di serî de gotibû. Ev xak, jêderkeke mirovahî û şaristaniyê ye. Kêm welat hene ku xwediyê vê taybetiyê ne. Divê em kurd bizanibin ku em xwediyê çi hêjahiyê ne. Bi

saya welatê kurdan dîroka dinyayê, beşên tarî, tên ronîkirin. Ji vê yekê re Newala Çorî nimûneyeke girîng e.

Pîştî bermahî û şopên ku ji wê derê derketin, raman û tezên li ser dîroka cîhana me ya emekdar serobino bûn.

Digel vê rewşa welatê me, divê ji çand û zargotina (folklor) me jî bê behskirin. Tu berhemên kîjan zanyarî dixwîni, yên ku li ser civat û dîroka kurdan rawestiyane, pergî rasteqîniyekê têtî. Ew jî ev e ku kurd, xwediyê dewlemendiyeke çandî û edebiyateke devkî ne.

Gelo, digel vê yekê, ji çan-

deke xwerû û sade dikare bê qalkirin. Bi ya min, na. Ji ber ku Mezopotamyayê jî bexçeyek qewman, cihê ceng û şeran bûye. Li ser devê rîyan bûye. Çûnehat tê de pir çêbûye. Ne gengaz e ku ew gelê xweçihî ji biyanan bandor nestandibe. Her wiha bandor li wan jî kiriye. Heke em bi çavekî lêkolînerî jî li civata xwe binêrin, emê gelek nimûneyên ku vê rewşê diselmînin (îspat dike) bibînin.

Mînak. navê xwarineke ku ji hêkan tê çêkirin, romanî ye. Ma ev ne bandora romayîyan e? Tê zanîn ku di nav kurdan de keç porên xwe bi çil keziyan dihonin. Ev yek di çanda hiştîyan de jî heye.

Di dawîya nivîsê de em vê jî daxuyînin. Bi alîkariya çanda kurdî, zargotin û zimanê wî dikare der barê qewmên cînar ên çuyî de tişt bêne ronîkirin. Bi kurtî, kurd bi her aliyên xwe ve dikare bibe çiraya destê zanyaran, ên ku dixwazin dîroka dinyayê derxin rastê.

Li Tirkîyê dewletê hemû sazî û rêxistinên fermî xistine bin xizmeta şerê qirêjî. Ji televîzyon û çapemeniyê bigire heta bi sporê her tiştî li gorî şerê ku îro li Kurdistanê didome, hatine amadekirin. Rêxistinek ji wan jî Serokatiya Karên Olî ye (Diyanet İşleri Başkanlığı)

Ev saziya fermî, di van mehên dawî de bala kurdan baş dikişîne ser xwe. Tevî serokê wê yê ku bi xwe jî kurd e. Nuri Yılmaz di van rojan de kar û şixulên xwe tev hiştîye bi pey qedexekirina wergera Quranê ya ku ji aliyê Abdullah Varlı ve hatiye

wergerandin, ketiye. Ev xebata Abdullah Varlı tevî kêmasiyên xwe jî, ji bo destpêkê xebateke baş e. Mafên kurdan jî heye ku ola xwe bi zimanê xwe hîn bibe.

Lê wisa dixuye ku ev yek ji kurdan re zêde tê dîtî. Nuri yê misilman, gava ku bihist xebateke bi vî awayî çêbûye, rabû got: "Bi zimanê kurdî Quran nayê weşandin." Li ser vê biryarê jî hêzên dewletê yê din ev werger qedexe kirin.

Çawa ku kurd nikarin bi zimanê xwe bi axivin, bifikirin, weşanan biweşî-

nin, televîzyonê bi zimanê xwe ava bikin, dibistanê xwe ava bikin, li çanda xwe, li dîroka xwe, li jiyana xwe, li xwe xwedî derkevin bi vê biryarê hate eşkerekirin ku nikarin bi zimanê xwe ola xwe jî hîn bibin, baweriya bi Yezdanê xwe jî bînin zimên.

Divê gelê kurd li ser vî mijarê baş bisekinin û binihêrin ka armanca dewletê çi ye. Armanca sazkirina van saziyan çi ne? Ji bo çî jiyanan wan heta bi a parlementerên wan qedexe ye, lê belê partyên ku xwe oldar nî-

şan didin ew qas bi serbestî tevger dikin û destekê ji dewletê distînin. Mînak: Partiya Refahê. Ji aliyê din ve li ser zimanê serokwezîr û serokomar behsa Quranê û dengê azanê kêm nabe.

Divê baş bê zanîn ku ev xebat tev ne ji ber oldarîbûna van kesan e. Bi vî awayî rûyê xwe yê bi qirêjî jî mirovahiyê dixwazin weşêrin. Dixwazin wan kesên ku bi baweriyeke saf oldariya xwe dimeşînin bikin alîgirê qirêj û gemariyên xwe. Vê xebatê jî nikarin bi tena xwe bikin, bi çapemeni-

yê, bi televîzyonê û saziyên din dikin. Lê xwediyê malê û diz bi hev hesiyane.

Baweriya mirovan di nava mirovan û Yezdanê wan daye. di nav mirovahiyê de îro cur bi cur ol û mezhep hene. her olekî jî li gor xwe xwedî bawerî û qayde ne.

Dêre wan, mizgeftên wan, sînagogên wan hene. Mafên kesî li ser kesî tune ye ku ambargo deynin ser baweriya mirovan. Lê belê îro tiştên ku dibin ev in. Gelê me hişyar bûye. Dostê xwe jî, dijminê xwe jî nas kiriye.

M. BEDRAN BÊNAV

## Tirkîye û baweriya mirovan

### FERHENGOK

**Afirandin:** Peydakirin, xuliqandin. **Aram:** Sebir, li dîrî te ez bêaram im. **Azar:** Êş, êşkence, skenc. **Behî:** Taziye. Mala Silêman behiya xwe danandin. Emê jî herin behiya wan. **Bend:** Sed, qeyd, girêdan. Sîmkirina devereke, yan jî dorpêçkirina cihekî bi keviran. **Bendav:** Pêşgirtina avê, sukir, baraj. **Canewer:** Giyanewer, heywan. **Dalde:** Cihê ne li ber çavan, hinekî veşartî, yan jî cihê ku tav lê nade. **Erk:** Wezîfe. **Ewle:** Emîn. **Ewletî:** Emniyet. **Kolik:** Patik, paştû, navbera her du sermilkan. **Kone:** Kesê serpêhatî, xasûk, qurnaz. **Kulîmek:** Hêt, tilm, navbera navtengê û her du ranan. **Mîşext:** Sergûn, hîcret, derbederî. **Navteng:** Noq, navbera sîngê û kulîmekê. **Nepenî:** Veşartî, lê li cihekî ku mirov bîr nabe ser. **Paşçavkirin:** Înkâr, înkarkirin. **Paşguhkirin:** Îhmal, îhmalkirin. **Pawan:** Îhtîkar, monopol, (tekel) **Pêrgî:** Lihevraştatin, lêraştatin, leqayîhevhatin. **Sîm:** Zîv, her wisa ji tîlê re jî tê gotin, nimûne: Dormandorî bexçeyê me sîmkirî ye. **Sûd:** Feyde, siyaseta dewletê ya paşçavkirina doza kurdî bêsûde ye. **Şiyan:** Karîn, jêhatin, taqet. **Yarmetî:** Musaede, alîkarî.. **Zêmar:** Stranên ku li ser miriyan tê gotin (ağit)

### AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

Li derve buhayê rojnameyê 3 DM e.

Bedelê Abonetiyê ez radizinim

LI Tirkîyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

LI Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV : .....  
NAVNİŞAN : .....

Navnişana Welatê Me  
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.  
Tel-Fax: 293 53 19 – 293 53 20

### WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
ROZA Basın ve Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)

Aynur BOZKURT

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)

Zana FARQÎNÎ  
Aynur BOZKURT  
Sami TAN  
Suut KILIÇ

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
(Yazışleri Müdürü)

Metin AKSOY

NAVNIŞAN (Adres)  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX  
293 53 19 – 293 53 20

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ  
(Temsilcilikler)  
Çukurova– Salihe Kevirbiri  
322-3597930  
Suriye– Jan Dost  
Fener Rojbiyanî  
Berlin– Silêman Sido  
Sirwan Reşîd  
49-30-69002695

Hannover– Selim Biçûk  
49-5721-81360  
Hamburg– A.Hekim Gülsün  
49-40-403388

Munchen– Mahmut Gergertli  
49-871-670884  
Badenwurttemberg–  
A. Rahim Ayaz  
49-75453258

Amsterdam– Cotyar Zaxoy  
31-20-6130766

Paris– M.S. Ayçiçek  
33-1-48000401

Atina– Ferhan Zêbarî  
30-13634905

Bruksel– Medenî Ferho  
32-16-490767  
Stockholm–  
Robin Rewşen  
46-8-7510564



# Nameyek ji xalê min î hêja û delal Musa Anter re

**Mûsayê kurd,  
berî bi sê salan jî  
nava me bar kir, lê  
xne bi hemdê  
we. Di  
20.9.1992'yan  
de li paytexta  
welatê xwe  
hate şehîdkirin.  
Hüseyin Deniz,  
xwarziyê wî  
jî wekî wî, li  
Serêkaniyê di 9'ê  
gelawêja 1992'yan  
de jî nav me  
hildan û birin.**

Xalê min î delal û birayê min î şîrîn Musa Anter û Hüseyin Deniz! Ez bi dilekî germ, bi hurmet dest bi nameya xwe dikim. Xalo can gelek silav li we û hemû şehîdên bêmirin,

rojnamevan û nivîskaran teva dikim. De ka ezê çi binivîsim? Min gelek bêriya we kiriye, berê vê dibêjim. Xalo can, birayê şîrîn! Ji dema ku hûn şehîd ketin û bi vir de gelek pêşketin û guherîn çêbûn, jî ber ku ziman û rastî qedexe ye.

Ezê bi kurtayî jî we re binivîsim. Yek jî wan, daxwaziya we yî ku we dixwest bê cih, televîzyona kurdan jî hate avakirin. MED TV ava bû. Di nameya xwe de ez jî wan re jî spasîyê xwe dişînim. Xalo, êdî Welatê jî bûye Welatê Me. Ev nav jî pir xweş e. Xalo can, birayê şîrîn! Roj û şevên me bi behsa we derbas dibin, hûn her roj di jiyanê me de jîn dibin. Dilê we rehet be bi kibiryarî



**Apê Mûsa (li navînî) û Hüseyin Deniz (bi berçavk)**

la xwarî di tariyê de jî ketinê bitirse. Ew kesên nezan ku bi şaşî gule li bedena we ya rast barand, bila jî xwe re bibêje ka çi qezenc kir; ne tiştêk jî.

Rastî jî çinara 74 salî ku rehê xwe kûr berdayê, ma mûmkûn e hişk bibe. Çi qas bê birîn jî, şaxên xurt jê diçin. Xalo

can, çinara te yî di nav erdê te de hîn bilindtir bûye. Bexçeyê te yî şîn, kulîlkên sor û zer vekirin. Pir xweş bûye bexçeyê te. Ez car caran diçim wir û di nav de digirim, hesreta dilan derdixînim û dû re jî li ber gora te disekinim. Vê axa ku bedena te yî nazik diparêze bi hurmet maçî dikim û

ji bo parastina wê, serê xwe jê re datînim. Sê sal li ser şehîdbûna we derbas bû û kete 4 saliya xwe. Ew kesên ku hûn qetil kirin, bila jî rebeniya xwe re rûnên û bigirin. Şehîdbûna we li we pîroz be, bimînin di xweşiyê de. Bi silav û hurmetan.

**EDLA DENİZ**

## 'Mebûs bêne kuştin gelê kurd wê zû bigihîje serkeftinê'

Ev gotin ya rehmetiyê Mehmet Sincar berî ku bi deh rojan şehîd bibe anîbû zimên. Li herêma Mêrdînê li partiya DEPê got: "Ez dixwazim mebûs bîn kuştin, yanî em. Wê çaxê, serkeftina gelê kurd nêzik bibe."

Ez di Rojnameya Özgür

Gündemê de dixebitîm û wê demê Mehmet û Ali Yiğit hatibûn welêt. Ji bo ku serokên belediyeyan têkevin nav DEP'ê em bi hev re digeriyan, axaftin bi wan re pê dianîn.


Gava ku Mehmet wisa got, apê Tewfik (bavê wî) wiha bi nêrînekê lê nihêrî û qet tiştêk

negot. Lê li ser vê gotina wî Mehdi Aslan (Li Mêrdînê Serokê DEP'ê bû) û Şehmus Çağro (Serokê navenda navendî ya DEP'ê yê li Mêrdînê bû) û mêvanên amade guftûgo çêkirin. Mehmet dimizicî û guftûgo germ nedikir. Wî bi wî kenê xwe tiştin dianî bîra

mirov. Wekî ku digot, ne bi şehadetê be tu serkeftin çêna-be. Ev mizicandina Mehmet birayê wî yê rehmetî Şukrî anî bîra min. Şukrî şervan bû û şehîd ket. Hevalê min î herî nêzik bû. Berî ku bibe şervan em nêzî salekê li ba hev man. Gava ku em li ser mijarekê bi-axiviyana, wî wekî pîrsa neteweyî, rizgarîkirina gelê kurd, çepgiriya tirkên, têkoşina bi rêbertiya PKK'ê û hwd... di-axivî. Şukrî hema dikeniya. Para xwe bi kenê xwe dixist nava guftûgoyê. Kenê Mehmet û yê Şukrî çiqas di teşbihê hev de bûn, nexwe birayên hev bûn.

Ez malbata Mehmet Sincar baş nas dikim. Têkiliyê min ên nêzik bi wan re çêbûn û berdewam dike. Birayê wî yê biçûk û xwişkeke wî jî zehf nêzikî min e. Li hêla şehadetê, min jî bi wan re hûsên wan par kiriye. Çiqas mirovin qewîn in. Gava ku cendê rehmetî Mehmet anîn Qoserê bi lîrandînê rahiştin. Gotin tîlî lî lî, lî...lî, xelk hemû şaş mabûn. Ev jî gelê kurd re bû derseke herî mezin. Ango ji niha û pê ve şehîdên me çêbibe pêwîst e em bilîrin.

Rojekê ez çûm girtîgeha Ceyhanê. Li Edenê piştî şeha-



**Mehmet Sincar**

deta Şukrî çend meh derbas bûbû. Min xwişka wî ya li Edenê rûdinê dît. Çav li min ket û got: "Ma kanî hevalê te Şukrî?" Bi rastî hêsirên min hat xwarê. Min got xwişkê ez Şukrî me." Gava ku min wisa got, wê jî ev bersiv da min: "Bila serê Kurdistanê sax be."

Min got wê çiqas malbateke bi deya x e. Kurdistanêke rizgar ji hemûyan re dermanek e, hêzeke xurt e. Xwişkê di şehadeta Mehmet Sincar de jî ji min re got: "Em elimîn şehadetê. Bila neyar bibehice. Kurdistan bila sax be."



**Mehmet Sincar di rezbera 1993'an de li Batmanê hate kuştin.**

**FEREC KURÊŞIVAN**